# Tenduristiya Tirkiyeyê xirabtir e



## PEYAMA AHMET TURK

*HEVŞAREDARÊ* Bajarê Mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk li gel ku nexweş e jî di Girtîgeha Tîpa T a Xarpêtê de tê ragirtin. Parlamenterê CHP'ê Sezgîn Tanrikulu li girtîgehê Ahmet Turk ziyaret kir. Turk di ziyaretê de diyar kir ku tenduristiya Tirkiyeyê ji tenduristiya wî xirabtir e.

## HEVŞAREDAR BINÇAV KIRIN

*DI ÇARÇOVEYA* lêpirsîna Serdozgeriya Komarê ya Amedê de hevşaredarê Karazê Affullah Kar ê ku ji aliyê waliyê Amedê ve ji peywirê hatibû girtin, hat binçavkirin. Herî dawî hevşaredarên Nisêbînê û Bêgiriyê hatibûn girtin û qeyûm tayînî şaredariyên Bazîd û Elbak jî kiribûn... R - 6

ROJEVA **Medya**

29 Çile Yekşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 80




# Dostên Ocalan li hev dicivin




## BERTEKÊN LI DIJÎ TECRÎDÊ

Dewleta tirk 18 sal in li girava Îmraliyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîd dike. Beriya salvegera Komploya Navneteweyî 15'ê Sibatê bertekên li hemberî tecrîdê zêde dibin û gel bi dengekî bilind azadiya Ocalan dixwaze. Kurdistanî û dostên kurdan bi rojane li Ewropayê li dijî tecrîdê çalakiyên girseyî li dar dixin.

## AMADEKARIYÊN MEŞA DIRÊJ

Meşa Dirêj bi dirûşma 'Ji Ocalan re azadî, ji Kurdistanê re statu' 1'ê sibatê li Luksemburgê dest pê dike û 11'ê sibatê li Strabourgê diqede. Ji welatên cihê yên Ewropayê enternasyonalîst ji bo meşê hatin. Dostên kurdan, bang li rêxistin, saziyên sivîl û civakî kir ku tev li meşê bibin... RÛPEL - 6

## Ji qirkirina siyasî re NA

OPERASYONÊN qirkirina siyasî dewam dikin û duh jî gelek siyasetmedar hatin binçavkirin. Parlamenterên HDP'ê Huda Kaya û Meral Daniş Beştaş hatin binçavkirin. Demeke dirêj der barê cihê binçavkirina Huda Kaya de agahî nehatin dayîn. Her wiha ji bo referandûmê eniya NA her ku diçe berfireh dibe... R - 6/7


## Jinan starta NA'yê da

"Jinên Dibêjin Na" bi deklerasyonekê starta kampanyaya 'na'yê da û wiha got: "Em jin li dijî serokdewletî û rejîma yekkesî, ji bo azadî, wekhevî, aştî, pêşeroj û destkeftiyên xwe dibêjin 'na'." ...
***RÛPEL - 2***

## Ganî ma wayîrê Rayberîye bivejyî

Cinîyê êzidî tecrîdo ke Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ser de yeno meşnayîş ser o wina vatî: "Eke ma fermanî ra ver (kir û felsefeya Rayber Apoyî nas bikerdênê, ewro hende cinîyê êzidî nêkewtênê destê çeteyanê DAIŞî. Ganî seba azadîya Rayber Apoyî têkoşîn bêro dayîş." ... RÛPEL - 11





## Li Gurgumê mirina biguman

Endamê Meclisa Şaredariya Sarayê yê DBP'yî Burhan Ozevlî ku piştî ji Wanê çû Gurgumê agahî jê nehat wergirtin, di hundirê wesayîta xwe de mirî hat dîtin. Zêdetirî hefteyekê ye agahî ji Ozevlî nedihat wergirtin. Sedema mirina Ozevlî dê piştî otopsiyê aşkera bibe... RÛPEL -3

## Li Xançepekê kûç li ser kûç nehiştin

**TAXA XANÇEPEK A SÛRA AMEDÊ** ku bû hedefa tang û topan, piştî hat dorpêçkirin û kolan li mirovan hatin qedexekirin, wêneyê wê yê dawn derket holê. Li Xançepekê kûç li ser kûç nemaye. Taxa ku hezar û 500 kes lê diman, niha bi tenê 44 malan çêdikin.





## Hovîtiya bêsînor

Artêşa tirk di 26'ê çileyê de li ser sînorê Rojava 7 welatiyên vedigeriyan gundê xwe, gulebaran kirin. Di encamê de 3 kes şehîd bûn û 5 kes jî birîndar bûn. Dayik û gel, her çend gulebaran hebe jî, çûn û her sê cenaze û birîndar rakirin... RÛPEL - 5

**Nobeta** mala xwe digirin R3

Rêwingê 21 salan: **Helwest Partîzan** R8

**Trump** artêşa DYA'yê nû dike R4

## Rêxistina Sara li dijî tundiyê tê dikoşe

**ENDAMA RÊVEBERIYA RÊXISTINA SARA** ya Li Dijî Tundiya li Ser Jinan ya Kantona Efrînê Gulistan Arîf têkîldarê rêxistin, parastin û wekheviya di navbera jin û zilaman de axivî. Gulistan Arîf diyar kir ku rêxistina Sara li Kantona Efrînê di sala 2016'an de 150 dozên girêdayî tundiya li ser jinan çareser kirine. Gulistan Arîf da zanîn ku ew wek rêxistin Sara li dijî zewaca bi zorê û kuştina jinan in ku were xwestin dê her roj ji bo mafê jinan çalakî pêk bînin. Gulîstan anî ziman ku ew li Kantona Efrînê ji bo naskirina rewşa jinên koçber, li kampên penaberan civînan lidar dixin û wiha got: "Li Kampên penaberan ên Kantona Efrînê weke kampa Rûbar û Şehba ji bo naskirina rewşa jinan li wir semîner tên dayîn. Armanc zanakirina jinan e." Gulîstan diyar kir ku ew ê di 2017'an de hîn bêhtir xebatên xwe berfirehtir bikin. Gulîstanê herî dawî bang li rêxistinên sivîl yên navneteweyî kir ku alîkariya aborî û manewî bi wan re bikin. **EFRÎN - ŞÛJIN**



# 'Jinên Dibêjin NA' dest bi xebatê kir

**"Jinên Dibêjn Na" bi deklerasyonekê starta kampanyaya 'na'yê da û wiha got: "Em jin li dijî serokdewletî û rejîma yekkesî, ji bo azadî, wekhevî, aştî, pêşeroj û destkeftiyên xwe dibêjin na."**

Komek jinên ku xwe bi navê "Jinên dibêjin na" bi rexistin kirin, li Otela Taksîm Hîllê bi deklerasyonekê starta kampanyaye "na"yê dan û sedema na'yê parve kirin. Jinan li salonê dowîzên "Jinên dibêjn na" rakirin û bi kaxizên reng û reng ên li ser çima "na"yê nivîsandiye û rozet belavkirin.

Di civînê de Hevberdevka Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) Gulistan Kiliç Koçyîgît, Berdevka Meclisa Jinên Sosyalîst (SKM) Fadîme Çelebî, Nûnerên Platforma Em Dê Cinayetên Jinan Rawestînin, Tevgera Jinên Azad (TJA), nûnerên CHP, HDP'ê û nûnerên gelek saziyên din ên jinan amade bûn.

Piştî stranê endama Koordînasyona 'Jinên Dibêjin Na' Rojda Yildiz axaftina vekirinê kir. Yildiz diyar kir ku ew hevî dikin ku na ji bo her kesî bibe sedema xêrê û got ku ew ê ji şîdeta ku li ser jinan re bêjin na. Deklerasyona jinan ji aliyê endama Koordînasyona "Jinên dibêjin na" Burçak Gorel ve hat xwendin. Deklerasyona jinan wiha ye: "Em wekî "Jinên dibêjin na" ji bo na-xêrê ketin rê. Em diwazin hemû bi hevre li pêşeroja xwe û jiyana xwe xwedî derkevin. Em kîne çi dixwazin. Em çima bi israr û înat dibêjin na? Em jinên ku ji nasname, bawerî, ziman, çand, reng û nasnameyên cuda hatin li hev kom bûn û ji bo na em xwe bi rêxistin dikin. Dîrok hat guhertin, lê hevî û têkoşîna ku xwişkên me dewrî me kiriye qet nehat guhertin. Naye guhertin jî. Em wekî jin ji bo azadiya xwe û destkeftiyên xwe li dijî OHAL'a ku rê li pêş me digire dê ji bo guhertina makeqanûna di Referandûmê de bêjin na."

Di deklerasyonê de hat destnîşan kirin ku dê jin li hemberî tacîz, tacawiz, şîdet, kuştinan re bibêjin na û ev tişt hat gotin: "ger ku jin hêza xwe bikin yek dikarin pêşiya tahlukeyan bigirin. Ji bo jinan ji her tiştî re gotin na lê belê me dest ji têkoşîna xwe ber neda. Ji ber ku em li mal, tax, kolan, dibistan, cihê kar, meclis û cihên dewletê de wekhevî dixwazin û li van cihan jiyan û siyasetê diafirînin dibêjin na. Em carekdin dubare dikin; ji bo em îro veguherînin û sibê biguherînin niha bi gotina na destpê dikin. Em wekî jin, ji serokatiyê, rejîma yek zilamî, ji bo azadiya xwe, ji bo wekheviyê, ji bo siberoja xwe, ji bo hemû destkeftiyên me û tiştên em ê bidest bixin dibêjin na." ***STENBOL – DÎHABER***



### 'Em ê patrîarkayan bixin sandiqê'

**PIŞTÎ DEKLERASYONÊ** gelek jinan mafê axaftinê girt û di "Kursiya Vekirî" de çima dibêjin "na" sedemên wê ragihandin. Di kursiyê de ewil endama MYK a HDP'ê Prof. Dr. Beyza Ustun axivî û wiha got: "Em ji bo vî referandûmê nehatim cem hev, em weke jin jiyanê azad dikin." Ustun destnîşan kir ku çalakiya jinan mezintir e û wiha got: "Di referandûmê de reîsên wan, yek perestên wan, patriarkayên wan em ê bixin sandoqê." Ustun got ku wan soz dane jinên ku têdikoşin û bal kişand li ser şervanên jin ên li Rojava û wiha pêde çû: "Soza me ji hevalên me yên jin ên ku bedenên wan ji aliyê zilaman ve li erdê hatin kaşkirin hene, em ê jiyanê azad bikin. Soza me ji hevalên me yên ku li ber xwe didin, dibêjin aştî, têdikoşin, jiyan û mafên wan tune tên hesibandin de heye. Em ê li her derê jiyanê azad bikin, qad ên me ne. OHAL a wan nexema me ye."

### 'Roj roja hatina cem hev bû'

**ENDAMA MP A CHP'ê** Canan Kaftancioglu jî got ku "roj roja hatine gel hev bû" ev yek jî nîşan dide ku di referandûmê de dê "na" derkeve. Nivîskar Oya Baydar jî diyar kir ku tu fêdeya tirsê ji ecel re tuneye û yên ku bibêjin "na" mirovên aştîxwaz ên vî welatî ne û wiha axivî: "Divê em yekitiya xwe xira nekin, dibe ku armanca 'na'yên me cude be. Ev ne girîng e. Em bi yek devî bibêjin 'na' û ev bila ji bo xêrê be, ev peywira me ye."

Betul Celep a ku bi KHK'ê ve ji kar hate avêtin û li Kadikoyê dest bi berxwedanê kir jî diyar kir ku ew OHAL'ê jî KHK'ê jî nas nakin. Celep wiha axivî: "Em gelekî xurt in. Ez 'Na' ya jinên ku li kargehan li ber xwe didin, ji bo mafên xwe yên sendîkayê li dijî malbat, dewlet û karsazan têdikoşin li vir parve dikim."

### Ji bo 'na'yê hincet gelek in

**SEKRETERA BIRÊXISTINKIRINÊ** ya Federasyona Bektaşî Elewî (ABF) Sevîm Yalincinklioglu jî bi gotina "Wek jinên elewî bêguman em ê bibêjin 'na' ji bo vê gelek hincetên me hene" dest bi axaftina xwe kir wiha berdewam kir: "Em elewî û jinên elewî bêguman bibêjin 'na'. Ji bo ku bibêjin 'na' gelek hincetên me hene lê vê carê em ê civatên din jî bibînin. Em jinên elewî bi Ekîn Wan bibin yek û bibêjin 'na'." Li ser navê Însiyatîfa Dayikên Aştiyê Guler Bugday jî hincetên xwe yê 'na'yê wiha rêz kir: "Ji bo şer û mirin raweste me got 'na'. Me xwest rondikên dayikan rawestin û em ê dîsa bibêjin 'na'."

# Binpêkirin zêde bûne

Koordînatora Giştî ya Platforma Hevpar a Mafê Mirovan (ÎHOP) Feray Salman têkildarî binpêkirinên mafan yên bi KHK û OHAL'ê pêk tên nirxand. Salman diyar kir ku OHAL û KHK ji derveyê armanca xwe tên bi rêvebirin û mirov bêyî hincet tên îxrackirin û wiha got: "Tenê îxrac nekirin di heman demê de xebat ji holê hatin rakirin, qedexekirin û ceza dikin. şert û mercên îdamekirina wan jî holê rakirine û bi vê re



cezayê duyem dane."

Salman destnîşan kir ku binpêkirinên mafan yên mezin pêk tên bi van biryaran. Salman da zanîn ku belgeyên komeleyên jinan yên divê veşarî bimana hemû hatine desteserkirin û wiha axivî: "Ev li dijî hiqûqê ye. Bi girtina komeleyan sinor namîn in. Dest didin ser malê wan. Bi taybet dosyayên der barê jinan û zarokan de divê nekevin destê kesî. Şîdeta li ser jinan pirsgirêkek globale. Bi OHAL'ê re şîdet ji malê derketiye kolanan û derketiye asta herî jor. Ji ber vê divê tora di navbera jinan de xurtir be û îro bêhtir hewcedariya me bi piştevaniyê heye." ***WAN - ŞÛJIN***

# Dê ji bo azadiyê 'na'yê bi rêxistin bikin

Li Êlihê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad (TJA) gelek jinên endamên Meclisên Jinan yên HDP û DBP'ê di çarçoveya kampanyaya "Ji dîktatoriyê re na" de hatin cem hev. Wekîla Hevseroka DBP'ê Gulcîhan Şîmşek û parlamentera HDP'ê Ayşe Acar Başaran jî tev li çalakiyê bûn. Li salona ku daxuyanî hat dayîn wêneyên jinên kurd ên li Parîs û Sîlopiyê hatin qetilkirin hatin daliqandin û pankartên "Israra di berxwedanê de ji komployê re bersiv e", "Em ê bi rêberê xwe ve teqez bi ser kevin" hatin daliqandin.

Wekîla Hevseroka DBP'ê Gulcîhan Şîmşek bal kişand li ser pêvajoya ku tê jiyîn û wiha got: "Kurd ji bo nasnameya xwe li çar parçeyan têdikoşin. Em ji bo aştî, biratî û azadiyê hatin cem hev û li vir azadiyê biqîrin. Jinên kurd dê ji bo azadiyê têbikoşin û dê jin ji bo dawî lê anîna zilm û zordariyê dê bibêjin na. Em ê ji bo Abdullah Ocalan, ji bo azadiyê bibêjin Na. Gotina 'na' demokrasî û azadî ye." Şîmşek got ku heta jinek bi tenê jî bimîne dê têkoşîn bidome. Çalakiya bi dirûşm û bi stranên hunermendên Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) bi dawî bû. ***ÊLIH - DÎHABER***

# Civîna salane ya koordînasyona jinan

Koordînasyona Jinan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a her sê kantonên Rojava (Kobanê, Cizîr û Efrînê) bi armanca nirxandina rewşa jinan li her sê kantonan, civîna xwe ya salane li navenda Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Kantona Kobanê li dar xist. Hevseroka kantona Cizîrê Hêva Erebo, endama Meclisa Zagonsaz a Kantona Cizîrê Perwîn Mihemed, ji Kobanê hevseroka Meclisa Zagonsaz Foziye Ebdî, cîgira Meclisa Rêveber Bêrîvan Hesen, seroka Desteya Jinan Emîne Bekir, hevseroka Şaredariya Gel Zehre Berkel, hevseroka Meclisa Dadê Nesra Xelîl û endamên kantona Efrînê bi rêya Skypeyê beşdarî civînê bûn. Piştî rewşa siyasî hat nirxandin, rapora koordînasyona jinan ya her sê kantonan hat xwendin. Ji bo derxistina plansaziya xebatan nîqaş hatin kirin. Di civînê de ev biryar hatin dayîn:

- ✓ Piştgiriya herêma Şehbayê ji aliyê perwerde û vekirina kooperatîfan ve.
- ✓ Temamkirina xebatên avakirina Meclisa Dadê ya Jinan li her sê kantonan.
- ✓ Piştevaniya Projeya Federaliya Bakurê Sûriyeyê.
- ✓ Ji bo 8'ê Adarê lidarxistina hemleyên hevbeş.
- ✓ Bihêzkirin û aktîfkirina koordîneya di navbera desteyên jinan de li her sê Kantonên Rojava. ***KOBANÊ - ŞÛJIN***



## Mujde Ar jî dibêje 'na'

Li hemberî kampanyaya 'erê' ku ji aliyê kesên navdar ve li ser tora civakî hatiye destpêkirin, hem bertek zêde dibin hem jî piştgiriya ji bo kampanyaya 'na'yê zêde dibe. Yek ji van kesên ku piştgirî da kampanyaya 'na'yê jî lîstikavana navdar a Yeşîlçamê Mujde Ar e. Arê li ser hesabê xwe yê sosyal medyayê aşkera kir ku dê di referandûmê de bibêje na. **AMED**


# Burhan Ozevlî mirî hat dîtin

Endamê Meclisa Şaredariya Sarayê yê DBP'yî Burhan Ozevlû ku piştî ji Wanê çû Mereşê agahî jê nehat wergirtin, di hundirê wesayîta xwe de mirî hat dîtin. Ozevlû roja 13'ê çileyê bi wesayîta xwe çû Mereşê, roja 19'ê çileyê bi malbata xwe re axivî û diyar kir ku ew vedigere Wanê. Lê piştî 19'ê çileyê agahî jê nehat girtin. Malbata Ozevlû li ser vê yekê serî li Midûriyeta Emniyetê ya Bajêr dabû. Ozevlû nîvê şevê li hundirê wesayîta xwe, li Mereşê mirî hat dîtin. Sedema mirina Ozevlî dê piştî otopsiyê aşkera bibe. WAN



# Li Wanê malek di bin aşûtê de ma


Li taxa Çamli ya Rêya Armûşê ya Wanê mala welatiyê bi navê Nurettîn Katilmiş ê ku li ber peravên çiya bû, di bin aşûtê de ma. Ji ber aşûtê banê mal û ambarê hatin xwarê û dîwarên malê qelişîn. Di malê de tiştek bi kesekê nehat lê ziyana madî çêbû. Xwediyê malê Nurettîn Katilmiş der barê bûyerê de wiha got: "Aşût hat, em gelekî tirsiyan, em zû derketin ber deriye malê, me lê nêrî aşût ketiye ser banê malê. Di mala me de ziyan çêbû lê şukir ji Xwedê re tiştek bi kesekê nehat." WAN



# Berfê rêyên 383 gundan girtin

Li Xarpêtê ku 2 roj in bê navber berf dibare, rêya 383 gundan ji çûn û hatinê re hat girtin. Asta berfê li hin cihan heta 40 santîman bilind bû. Walîtiyê daxuyanî da û diyar kir ku ji ber barîna berfê rêyên 52 gundên navenda bajar, 87 gundên Qereqoçanê, 50 gundên Sîvrîce, 71 gundên Kovanciyan, 36 gundên Palo, 13 gundên Kebanê, 14 gundên Baskilê, 11 gundên Aricakê 37 gundên Madenê, 8 gundên Aginê û 4 gundên Alacakayayê bi giştî 383 gund têkiliya wan bi bajar û navçeyan re qut bûye. XARPÊT

# Înisiyatîfa Zindanan: Girtîgeh bûne malên mirinê



Însiyatîfa Piştevaniya Zindanan û Şaxa ÎHD'ê ya Îzmîrê, têkildarî rewşa girtiyên nexweş ên li Girtîgeha Tîpa R a Menemena Îzmîrê li avahiya ÎHD'ê ya Îzmîrê civîna çapemeniyê pêk anî. Însiyatîfê û ÎHD'ê bi armanca balê bikêşin ser rewşa girtiyên nexweş Ergîn Aktaş, Ahmedî Hamî û Yusuf Bulut ê 68 salî daxuyanî da û banga hestiyariyê kir. Li ser navê Însiyatîfa Zindanan Selma Altan daxuyanî da û diyar kir ku zindan bûne malên mirinê.

Altan diyar kir ku bi OHAL'ê re binpêkirina mafan li girtîgehan gelekî zêde bûye û wiha got: "Bi taybetî li Girtîgeha Tîpa R a Menemenê girtiyên nexweş nayên dermankirin. Girtî rastî neheqî û bêhiqûqiyê tên. Gav bi gav ber bi mirinê ve diçin. Li girtîgeha Tipa R a Menemenê bi mehan e girtiyê ku destê wî tune Ergîn Aktaş, nayê dermankirin. Li gel ku nexweşiya KOAH'ê pê re çêbûye jî nayê dermankirin. Girtî Ahmedî Hamî ji her du pêyên xwe felç e û nikare tev bigere. Ji ber felçê mecbûrî kursiya astengdaran e û wisa dikare tev bigere. Li gel ku bijîşk dixwazin rojê 2 caran tedawiya fîzîkî bibîne jî nayên dermankirin." Altan destnîşan kir ku divê Ahmedî Hamî bi lezgînî bê dermankirin û wiha axivî: "Li Girtîgeha Tîpa R a Menemenê kalê 68 salî Yusuf Bulut ji rûviyên xwe nexweş e û rewşa wî giran e. Bulut mehek berê anîn Girtîgeha Tîpa R a Menemenê û 24 saetan nikare ji nava nivînan derkeve. Em bang li raya giştî dikin ku hestiyar tev bigere." ÎZMÎR - DÎHABER

# Ji bo ku careke din neyê rûxandin nobetê digirin

**Li Nisêbînê ku bi têlan kirine du beş, ji hêlekê ve rûxandin ji hêlekê ve jî avakirin didome. Malbatên ku ji bo ku malên wan neyên rûxandin nobetê digirin, şik û gumana wan ew e ku malên wan bên rûxandin**

DÎCLE MUFTUOGLU / AYNUR ÎNEDÎ / MÊRDÎN- DÎHABER



Li Taxa Firatê li gel domandina rûxandinê, li deverên ku têlên rêsayî hinekî bi paş ve hatine kişandin, welatiyan dest bi avakirina avahiyên xwe kir. Ji ber ku ji aliyê rayedaran ve tu daxuyanî nehatine dayîn, welatî ji bo ku avahiyên wan neyên rûxandin nobetê digirin.

Li Nisêbîna Mêrdînê, têlên rêsayî jiyan dabeşî du parçeyan kiriye. Li gel têlên rêsayî ji aliyekî ve rûxandin, ji aliyekî ve jî avakirin didome. Di dema êrîşan de, ji ber ku hemû panoyên elektrîkê û tesîsatên avê xisar dîtiye, kar û bar rastî zehmetiyan tên û ji ber vê yekê avê bi boriyên ji deverên din dikişînin. Li dîwaran şop û qulên fîşek û guleyan pêşî bi sewaxê, paşê jî bi boyaxê tên girtin. Malbatên ku avakirina malên xwe temam kiriye, li gel tunebûna ceryan û avê jî, vedigerin malên xwe.

Dayika 9 zarokan Şukriye Akman a bi mehan dûrî mala xwe ma û piştî têlên rêsayî bi paş ve hatin kişandin vegeriyan mala xwe, tîne ziman ku dema ew vegeriyane, wan mala xwe nas nekiriye. Akman diyar dike ku ev 20 roj e hewl didin mala xwe ji nû ve ava bikin. Akman dibêje wan heta niha ji bo avakirinê 20 hezar TL xerc kiriye û diyar dike ku şik û gumana wan ew e ku piştî avakirinê mala wan bê rûxandin. Akman destnîşan dike ku ji bo rûxandinê rayedar agahiyê nadin xwediyên avahiyan û got ku biryar ji Enqereyê hatiye wergirtin û kepçe jî tên dirûxînin û wiha dibêje: "Em di nav vê zor û zehmetiyê de malên xwe çêdikin, lê bes bila neyên rûxandin. Tekane serweta me, malên me ne. Jixwe neheqiyeke mezin li me hat kirin, bila zêdetir nekin." Akman anî ziman ku karker bi rojan dixebitin û zêdebûna dolar bandorê li her tiştî kiriye û wiha got: "Ji ber ku dolar zêde dibe, her tişt zemê dixwe. Karker bêtir pereyan dixwazin, malzemeyên înşaatê zêde buha bûne."

# Xizmên windayan dîsa edalet xwestin

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û xizmên windayan li Amedê bi dirûşma "Bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin" cara 416'emîn çalakî li dar xist. Di çalakiyê de endamê Komînsyona Xizmên Windayan a ÎHD'ê Adnan Arhan axivî û diyar kir ku nêzî 9 sal in aqûbeta kesên ku hatine windakirin û bûne qurbanên kuştinên "kiryar nediyar" dipirsin û dê her tim bipirsin. Piştre parêzer Hasan Yalçin çîroka Cavît Ozalp ê di 21'ê tebaxa 1995'an de li navçeya Bismilê ya Amedê hat binçavkirin û piştre hat kuştin, parve kir. Daxuyaniya xizmên windayan piştî çalakiya rûniştinê ya 5 deqîqeyan bi dawî bû.

*Stenbol*: Dayikên Şemiyê ji bo aqûbeta xizmên xwe bipirsin di hefteya 618'an de, li Meydana Galatasarayê hatin cem hev. Vê hefteyê li aqûbeta Mehmet Şirîn Maltu yê 17 salî hat pirsîn ku ji mezrika Zediya ya girêdayî Kozluk a Êlihê bû, hatibû binçavkirin û careke din nehat dîtin. Birayê nûçegihan Nazim Babaoglu ku li Rihayê hat qetilkirin Îrfan Babaoglu û birayê Hayrettîn Eren Îkbal Eren axivîn. Dayika Mehmet Şîrin Maltu, Sabriye Maltu di çalakiyê de axivî û wiha got: "Ez goristanên me dixwazim. Ez hestiyên zarokên xwe dixwazim. Bêyî ku em li berf, baran, heriyê bisekinin, em ê lêgerîna xwe berdewam bikin." Piştre daxuyanî ji hêla Ozlem Dalkiran ve hat xwendin. Dalkiran anî ziman ku Mehmet Şîrîn Mutlu bi îşkenceyê hatiye kuştin û dewlet mecbûr e ku aqûbeta Maltu diyar bike. *ANF*



# Li Şirnexê her malekê çîrokeke xwe heye

Li Şirnexê deriyê kîjan malbatê were vekirin çîrokek jê derdikeve; çîrokeke jiyana zor û zehmet. Lê li hemberî vê zoriyê çîrokeke berxwedana jiyaneke birûmet heye.

Dayika 8 zarokan a 43 salî Leyla Ozen jî xwedî çîrokeke berxwedanê ye. Dayik Leyla jî wekî gelek malbatên Botanê di salên 90'î de ji gundê Navyan ê Şirnexê koçber bûye.

Wekî bi hezaran welatiyan xaniyê dayika Leyla yê li taxa Bahçelîevler jî di qedexeyê de hatiye hilweşandin. Dayika Leyla niha li taxa Yeşîlyûrtê bi zehmetî kirêya mala xwe dide.

Hevjînê dayika Leyla di sala 2012'an de di dema li kanên komirê yên li quntara çiyayê Cûdî dixebitî, jiyana xwe ji dest daye. Piştî ku hevjînê dayika Leyla jiyana xwe ji dest dide ew bi tena serê xwe li 8 zarokên xwe dinêre.

Dayika Leyla got ku ew her sal diçûn gund lê îsal neçûne. Li derdora mala dayika Leyla hema bêje hemû avahî hatine hilweşandin û dema dibe şev ji ber ku cîran tune ne, deriyê xwe digirin û heya serê sibê dernakevin derve. Ev yek jî xemgîniyê dike para dayika Leyla.

Dayika Behiye Ozkan li nîveka deverên ku hatiye hilweşandin rûniştiye û êzingên ku ji ber hilweşandinê mane, kom dike ji bo şewitandinê. Ji dayika Behiye wêdetir zarokên wê jî bermahiyên hêsin kom dikin. Beriya çend rojan polîsên ku hatine ber deriyê mala dayika Behiye bi hinceta, "dibe ku bombe di nav de hebe" dest danîne ser xurdeyên ku zarokên wê kom kirine.

*ŞIRNEX - DÎHABER*



## Kolombiya ji kokaînê paqij dibe

**XALÊN PEYMANA** aştiyê ya ku li Kolombiyayê di navbera hikumet û gerîlayên FARC'ê de hat mohrkirin, dikevin merîyetê. Yek ji xalên peymanê ya girîng bernameya li dijî narkotîkê ye. Bername ji aliyê nûnerê hikumetê Rafael Pardo û ji fermandarên FARC'ê Pastor Alape ve li paytext Bagotayê hat nasandin. Di çarçoveya bernameyê de tê xwestin ku îsal qadeke 50 hezar hektar ji kokaînê bê paqijkirin. Gerîlayên FARC'ê dê ji bo diyarkirina herêmên çandiniyê yên di bin kontrola wan de bi rengekî 'bêçek' li gel wezîfedarên dewletê tev bigerin. Fermandarê FARC'ê Pastor Alape diyar kir ku zeviyên ji çandiniya kokaînê bên paqijkirin li gundiyan bê belavkirin û bê diyarkirin ku lê çi bê çandin. Li gorî rayedarên hikumetê, maliyeteke zêdetirî milyarek pezo (340 milyon dolar) ji bernameyê re bê veqetandin. **BAGOTA**



# Artêşa Amerîkayê ji nû ve saz dikin

**Trump ferman da ku artêşa Amerîkayê ji nû ve bê sazkirin û daxwaz kir ku ji aliyê wezareta parastinê ve ji bo têkoşîna li dijî DAIŞ'ê planeke berfireh bê amadekirin. Her wiha Trump ketina penaberên welatên misilman a Amerîkayê jî qedexe kir**

Serokê Amerîkayê Donald Trump ê ku di rojên borî de îmze avêt gelek pêkanînên binîqaş, tev li merasîma sondxwarina wezîrê parastinê James Mattis bû û ferman da ku artêşa Amerîkayê ji nû ve bê sazkirin.

Trump di merasîmê de axivî û diyar kir ku biryarnameya serokatiyê ya jinûveavakirina Hêzên Çekdar ên Amerîkayê îmze dike û wiha got: "Ji nû ve sazkirina artêşê dê kongreyê jî gelekî kêfxweş bike."

Trump di merasîmê de wezîr Mattis jî wek mirovê dema rast pênase kir.

Li aliyê din hat ragihandin ku Wezerata Parastinê ya Amerîkayê (Pentagon) li ser daxwaza Trump ji bo têkoşîna li dijî DAIŞ'ê amadekariya planeke berfireh dike û dê ev plan di nav 30 rojan de bê amadekirin.

Wezîr Mattis ê ku nû dest bi wezîrtiya parastinê kir, daxwaz kir ku di nav 90 rojan de bûdçeya xwe ya 2018'an li gorî stratejiya neteweyî ya nû guncaw bike û pergalên moşekên parastinê bi hêz bike.

Her wiha Trump ê ku ketina penaberên misilman a Amerîkayê asteng kir, di axaftina xwe ya li Tora Weşanê ya Xirîstiyanan (CBN) de destnîşan kir ku dê di qebûlkirina penaberan a ji bo Amerîkayê de, pêşî rê bidin xirîstiyanan. Trump bi rêya telefonê bi serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn re hevdîtin pêk anî. ***WASHINGTON***

### Qebûlkirina YEKEMÎN

**SEROKÊ AMERÎKAYÊ** Donald Trump hevdîtina xwe ya fermî ya yekemîn bi serokwezîra Brîtanyayê Theresa May re kir. Hat ragihandin ku Trump û May di hevdîtinê de li ser têkiliyên her du welatan rawestiyan û Trump daye xuyakirin ku rojên bêhempa li pêşiya gelên her du welatan in. Her wiha Trump li ser daxwaza May dê di nav salê de serdana Brîtanyayê bike.



### Trump sînor ji penaberan re girt

**SEROKÊ AMERÎKAYÊ** Donald Trump biryarnameya qedexekirina penaberan a ketina Amerîkayê ya ku çend roj beriya niha ket rojevê îmze kir. Li gorî biryarnameyê sînorê Amerîkayê ji penaberên welatên misilman ên wekî Iraq, Yemen, Îran, Sûdan, Somalî û Lîbyayê re hat girtin. Her wiha penaberên ku ji Sûriyeyê bên jî li gorî krîtera xiristiyanbûnê dê bên qebûlkirin.

## Rola Tirkiyeyê ya komkujiyê nirxandin

Di civîna komîsyona komkujiya Brukselê de ku di 22'yê adara 2016'an de pêk hat, rola Tirkiyeyê hat nirxandin û hat destnîşankirin ku rayedarên tirk bi awayekî zanebûn kiryarê komkujiyê El Bakraoui radestî Balçîkayê nekiriye û derfet danê ku biçe Hollandayê.

Muşawîrê ewlehiyê yê li konsolosxaneya Belçîkayê ya li Stenbolê Sebatien Joris ji komîsyona lêkolînê ya li Parlamentoya Federal a Belçîkayê re axivî.

Joris da xuyakirin ku agahiya li ser girtina El Bakraoui li Dîlokê piştî 15 rojan ji wan re hatiye ragihandin. Joris da zanîn ku li gel El Bakraoui welatiyê Belçîkayê ye jî, bi awayekî zanebûn li şûna Belçîkayê, ji bo Hollandayê hatiye dersînorkirin.

Komîserê polîsên Belçîkayê yê ji hevkariya navneteweyî berpirsyar Peter De Buysscher jî, rayedarên tirk sûcdar kirin û got ku heke di dema xwe de agahî bihatana dayîn dê Belçîka li dijî El Bakraoui biketa nav tevgerê.

Serokomarê tirk Tayyîp Erdogan wê demê ji ber ku konê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Bruksela hatibû vedan, Belçîka kiribû hedefa xwe û bi teqîna bombeyan li Belçîkayê gef xwaribûn.


Ev daxuyaniya Erdogan jî gumana Belçîkayê piştrast dike. ***BRUKSEL***

## 'Cîhan xwe ji bo şerekî amade dike'

Lîderê dawîn ê Yekitiya Komarên Sovyet ên Sosyalîst Mîhaîl Gorbaçov wek nivîskarekî mêvan nêrînên xwe di hejmara nû ya kovara Time de parve kirin. Gorbaçov di nivîsa xwe de destnîşan kir ku cîhan xwe ji şerekî mezin re amade dike û got ku serokê Amerîkayê Donald Trump û serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn û rayedarên wan ên siyasî û leşkerî hêj bêhtir şerxwaz xuya dikin û doktrînên xeternak belav dikin.

Gorbaçov di nivîsa xwe de da zanîn ku li gel bûdçeyên dewletan ji bo pêdiviyên bingehîn ên welatiyan nabin bersiv jî, razemeniya xwe ya ji bo çekan berdewam dikin. Mîhaîl Gorbaçov di berdewama nivîsa xwe de bal kişand ser pirsgirêkên xizanî, hawirdor, koçberî û kêmbûna çavkaniyan û destnîşan kir ku şerê bê kirin jî dê pirsgirêkan çareser neke.

Gobaçov di dawiya nivîsa xwe de daxwaza qedexekirina şer kir û ji Trump û Putîn xwest ku ji bo pêşnûmayeke li dijî çekên atomê ji aliyê Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ve bê qebûlkirin, pêşengiyê bikin. ***LONDON***





## Qurbanî bi bîr anîn

Li gelemperiya Swêdê ji bo bîranîna 6 milyon qurbaniyên komkujiya navneteweyî ya dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn 200 çalakî hatin lidarxistin.

Serokwezîrê Swêdê Stefan Lofven jî di nav de, bi sedan kesên ku tev li çalakiyan bûn, li ber bîrdariyan find vêxistin û qurbanî bi bîr anîn. Çalakiya herî mezin li qada Raoul Wallanbergê ya ku wek nîşaneya rizgarkirina ji komkujiyê tê nasîn, pêk hat. Raoul Wallanberg di dema şer de hezar cihû û polonyayî ji komkujiyê rizgar kiribûn. ***STOCKHOLM***

## Piştî Astanayê bi hev ketin

Piştî civîna Astanayê rageşiya di navbera eniyên çeteyên Ehrar El Şam û Eniya Fetha Şamê (El Nusra) her ku diçe zêde dibe. Piştî civîna ku li Astanayê pêk hat û encamên ku eniyên çekdar dixwestin jê derneketin, bi hev ketin. Koma Ceyşul Îslam a ku beşdarî Ehrar El Şamê bû, li başûrê Îdlibê bi tang û topan êrîşî çeteyên El Nusrayê kir.

Bi rojan e di navbera komên çete de amadekariyên şer tên kirin û tê payîn ku di navbera komên çete de şerekî dijwar rû bide.

Beriya civîna Astanayê ya ku bi garantoriya Îran, Rûsya û Tirkiyeyê pêk hat, biryargeha Eniya Fetha Şamê ya li Îdbilê ji aliyê balafirên şer ên Amerîkayê ve hat bombekirin. Hat diyarkirin ku di vê êrîşê de zêdetirî 100 çeteyên El Nusrayê hatin kuştin.

El Nusrayê diyar kir ku koordînatên biryargehê kesên di nav komên OSO û Ehrar El Şamê de dane. Piştî civîna Astanayê rageşiya di navbera çeteyên Ehrar El Şam û Eniya Fetha Şamê de vegeriya şerê bi tang û topan. ***ÎDLIB***

## Piştî Amerîkayê hat serdana Tirkiyeyê



Serokwezîra Brîtanyayê Theresa May piştî serdana xwe ya Amerîkayê, serdana Tirkiyeyê kir. May ku cara yekemîn e serdana Tirkiyeyê dike, serokwezîrê Tirkiyeyê Bînalî Yildirim û serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan ziyaret kirin. Hat ragihandin ku Yildirim û Erdogan bi May re li ser bazirganî û ewlehiyê biaxivin û di mijara ewlehiyê de alîkariyê jê bixwazin.

Li aliyê din hat ragihandin ku May mijara Kibrisê jî bi Yildirim û Erdogan re nîqaş kiriye û ji wan daxwaz kiriye ku alîkariya çareseriya pirsgirêka Kibrisê bikin. Nûçegihanê Rojhilata Navîn ê rojnameya Independentê Patrick Cockburn serdana May a Tirkiyeyê nirxand û diyar kir ku serdan durûtî ye û tê wateya alîkariya têkbirina demokrasiya Tirkiyeyê. ***AMED***

www.arsivakurdi.org

# Federalî ji Rûsyayê re hat vegotin

CÎHAD ROJ/ QAMIŞLO - ANHA

Şandeya rêveberiya xweser a ku tev li civînên Moskovê bû, diyar kir ku wan di civînê de ji Moskovê re projeya federaliya demokratîk pêşniyar kiriye. Şandeyê da zanîn ku her wiha wan avakirina şandeyek ji hêzên muxalîf ji bo danûstandinên Cenevreyê jî pêşniyar kiriye.

Li ser vexwendina fermî ya Wezîrê Karê Derve yê Rûsyayê Sergei Lavrov, şandeyek ji rêveberiyên xweseriya demokratîk çûn Moskovê. Şandeya rojava ji nûnerên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Xalid Îsa û Ebdulselam Elî pêk dihat. Şandeyê da zanîn ku wan di civînê de civîna Astanayê û rêya herî guncav a ji bo danûstandinên Cenevreyê nîqaş kirine.

Şandeyê di civînê de têbiniyên xwe der barê reşnîvîsa destura Rûsyayê û xalên ku divê werin guhertin pêşkêşî aliyê Rûsyayê kir. Li ser vê yekê aliyên Rûsyayê jî diyar kirin ku projeya wan tenê weke pêşniyarekê ye û dê gelê Sûriyeyê biryarê bi xwe bide. Di civînê de şandeya Rojava jî projeya federaliya demokratîk pêşkêşî Rûsiya û hêzên muxalîf ên tev li civînê bûn kir û bingeha vê projeyê li ser rêvberiya xweseriya demokratîk şîrove kir.

Şandeyê da zanîn ku tevlibûna wan a ji bo civînên bi vî rengî girînge. Xalid Îsa herî dawî jî ev tişt anîn ziman: "Beşdarên civînê banga şandeyeke ku ji hemû pêkhateyên Sûriyeyê pêk tê yên hêzên muxalefetê ku tev li civîna Cenevreyê bibin, kir. Beşdaran dan zanîn ku encax bi vê yekê biryarên navdewletî yên madeya 2254'an ku weke nexşerêya avakirina Sûriyeyeke nû tê nasîn, bikevin meriyetê."



## Artêşa tirk êrîşî Rojava kir

YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku êrîşên artêşa tirk ên li dijî Rojava didomin. YPG'ê da zanîn ku di şeva 26'ê çileyê de helîkoptereke arteşa tirk sînore Rojava derbas kir û di navbera gundên Aşkan û Hamir ên giredayî Tirbespiyê bêserûber gulebaran kirine. YPG'ê diyar kir ku di heman şevê de 3 balafirên keşfê yên bê mirov ên Tirkiyeyê di navbera Tirbespiyê û Eyndiwerê de geriyane û piştre jî hemwelatiyên gundê Mezrê yê Eyndiwerê gulebaran kiriye. YPG'ê ragihand ku di vê êrîşê de 3 sivîl hatine qetilkirin. **QAMIŞLO**



## Çêkirina dîwarê şermê didome

Artêşa tirk a dagirker avakirina dîwarê şermê ku ji gundê Gerdîmiyê yê Beravê ya Dêrikê dest pê kir, didomîne. Çêkirina dîwarê ku bi armanca qutkirina kurdên Rojava û Bakur pêk tê, gundên Qesir Dîb derbas kir û gihiştiye gundê Habil Hiwerê. Artêşa bi vê boneyê sînor derbas dike û dest bi kolandinê dike. Çavkaniyên ji herêmê dan zanîn ku artêşa tirk di heman demê de gelê herêmê jî gulebaran dike. **DÊRIK**



## Kongreya PYD'ê hate taloqkirin

Komîteya Amadekar a Kongreya Rêxistina PYD'ê ya Amûdê amadekariyên xwe yên li dar xistina kongreyê bi dawî kiribûn. Di hat payîn ku dê kongre di 29'ê çileyê de were li dar xistin. Li gorî agahiyên ji çavkaniyên endamên PYD'e hatine wergirtin, ji ber rewşa hewayê ya dijwar û barîna berfê kongreya amadekar biryara paşde xistina kongreyê daye. Têkildarî li dar xistina dîroka kongreyê de jî endamên PYD'ê yên Amûdê tu agahî parve nekirin. **AMÛDÊ**



# Hovîtiya artêşa Erdogan di lûtkeyê de ye!

**Hovîtiya Tirkiyeyê ya li ser sînorê Rojava êdî di lûtkeyê de ye. Artêşa tirk a ku 3 sivîl qetil kirin nehişt ku welatiyên herêmê cenaze û birîndarên xwe ji ser sînor rakin. Di encamê de birîndarekî ji ber sermayê jiyana xwe ji dest da**



Artêşa tirk a dagirker di 27'ê çileyê de êrîşî welatiyên li ser sînor kiribûn û 2 kes qetil kiribûn û 5 kes jî birîndar kiribûn. Hat zanîn ku birîndareke din ê ku dewleta tirk destûr neda ku gel bigihijîne nexweşxaneyê jî jiyana xwe ji dest da.

Artêşa tirk a dagirker di 26'ê çileyê de 7 şêniyên Mezra yê Dêrikê dema ku ji gundekî nêzî gundê xwe vedigeriyan malê, gulebaran kirin. Di encamê de 2 welatî hatibûn qetilkirin û 5 jî bi giranî birîndar bibûn. Li ser vê yekê gelê li herêmê tevî hemû êrîşan jî xwe gihandibû qurbaniyan û 4 birîndar rizgar kiribûn. Lê cenazeyên 2 welatiyan û kesê birîndar ê bi navê Şêro Husên Ebdullah (40) tevî berf û baranê li ser sînor ma.

**DAYIKAN ANÎN**

Hat zanîn ku birîndar Husên Ebdullah piştî 40 saetan, di encama serma û windakirina xwînê de jiyana xwe ji dest da. Li ser vê yekê dayikên aştiyê tevî hemû êrîşên artêşa tirk jî çûn ser sînor û cenazeyên her sê welatiyan rakirin û anîn nexweşxaneya Dêrikê.

***DÊRIK - ANHA***

## Kobanê bû mîrasa hemû mirovahiyê



Fermandarên Meclisa Leşkerî ya Minbicê 2'yemîn salvegera rizgarkirina Kobanê pîroz kir û destnîşan kir ku serkeftina Kobanê pêngava guhertina herêmê bû.

Fermandarê Giştî yê Meclisa Leşkerî ya Minbicê Ednan Ebû Emced salvegera rizgarkirina Kobanê li gelên Rojava pîroz kir û wiha domand: "Bi berxwedana Kobanê re Minbic, Girê Spî û Sirîn hat rizgarkirin. Vê berxwedanê terora herî mezin a zêdetirî 30 dewlet pêre dibûn alîkar, têk bir. Ev bi alîkariya Tirkiyeyê pêk hat û xwest vîna gelê kurd bişkîne û rêveberiya xweser têk bibe."

Berdevkê fermî yê meclisê Şervan Derwîş ku ew jî di berxwedana Kobanê de bû jî diyar kir ku vê berxwedanê li herêmê guhertinên cidî pêk anîn û wiha bi dawî kir: "Bi hezaran pêkhateyên Sûriyeyê salveger pîroz kir. Ev ji bo me şahî û bextewariye. Kobanê bû bingehê hemû deskeftiyên herêmê û çarenûsa herêmê. Kobanê bû mîras û serkeftina hemû mirovahiyê."

***KOBANÊ - ANHA***

## 'Dê di federaliyê de jin pêşengiya civakê bikin'

Endama Meclisa Damezrîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Fedîle Mihemed da zanîn ku li gorî bendên hevpeymana civakî jin pêşengiya civakê dike.

Fedîle Mihemed anî ziman ku di çileya 2016'an de bi tevlibûna hemû pêkhateyan hevpeymana civakî hate erêkirin û ev nirxandin kir: "Di vê hepeymanê de jin û mêr wekhev in. Dê jin li gorî bendên hevpeymanê, gavên dîrokî bi avêje. Jinên li her deverên Sûriyeyê dikarin tevli me bibin û bi vê yekê jî bingeha Desteya Jinê ya Sûriyeyê tê avakirin."

Di dawiyê de jî Fedîle Mihemed wiha got: "Ji bo şopandina hilbijartinên li hersê kantonên Rojava, herêma Şehbayê û Minbicê hat avakirin. Dê di demeke nêz de hilbijartin pêk werin. Federaliya demokratîk çareseriya herî guncav e. Dê li gorî bendên hevpeymana civakî, jin pêşengiya civakê bike. Ji ber vê yekitiya jinên Sûriyeyê girînge." **EFRÎN - ANHA**



## Hilbijartin dê ji komunan dest pê bike

Hevserokê Desteya Bilind a Hilbijartinan Izedîn Ehmed got ku dê hilbijartina meclisên federaliya demokratîk ji komunan dest pê bike.


Bi armanca danasîna mekanîzmaya hilbijartina meclisên Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê, Komîteya Zagonên Hilbijartinan û Hevbeşkirina Rêveberiyê ku ji 12 endaman pêktê, hate avakirin. Der bare mijarê Izedîn Ehmed da zanîn ku armanca komîteyê amadekirina reşnivîsa zagonên hilbijartinê û mekanîzmaye hilbijartinê ye.



Ehmed destnîşan kir ku wan reşnivîsa hilbijartinên federaliyê amade kirine û wiha domand: "Teşe yê wê yê dawî jî me pêşkeşî meclisa damezirîner kir. Bi erêkirina meclisê jî dê ev zagon têkeve meriyetê. Hilbijartin dê ji komunan dest pê bike û bi meclisên tax û herêman bidome. Bi avakirina meclisên kantonan jî dê meclisên herêm û kongreya gelan were hilbijartin. Dê meclisên herêm û kantonan her du salan carekê û meclisên herêm û kongreya gelan jî 4 salan werin hilbijartin. Dê endamên meclisan sedî 60 ji hêla gel û sedî 40 jî ji hêla endaman ve dê werin hilbijartin." **AMÛDÊ - ANHA**

## Berfa zêde rêyên çiyayî girtin

Li herêma rojavayê Kurdistanê û bi taybet li kantona Efrînê ji 27'ê çileyê heta niha berf bi awayekî dijwar dibare. Rêyên çiyayî yên navçeya Bilbil a Efrînê ji ber barîna berfê ya zêde ji çûn û hatinê re hatin girtin. Bi taybet li herêmên çiyayî berf xwe li xwezayê dipêçe û rêyên ji gundên nêzî çiya yên weke Alî Garo, Qere Gol, Qaşa, Şerqiyê û Bîke û navçeya Bilbilê hatine girtin. Berf zêdetirî 20 santîmetreyan bilind bûye û hin bênavber di bare. **EFRÎN**



## Turk: Tenduristiya Tirkiyeyê xirabtir e

Rû spiyê kurd Ahmet Turk her çendî pirsgirêkên tenduristiyê bijî jî ji hêla dewleta AKP'ê ve hat girtin. Parlamenterê CHP'ê Sezgîn Tanrikulu li Girtîgeha Tîpa T a Xerpêtê Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk ziyaret kir. Tanrikulu piştî hevdîtinê peyama Turk bi raya giştî re parve kir. Tanrikulu, di hesabê xwe yê medyaya civakî de ev agahî parve kir: "Turk got tenduristiya min xerab e. Lê tenduristiya Tirkiye ji ya min xerabtir e." XARPÊT



## Hevşaredarê Karazê binçav kirin

Faşîzma dewleta tirk û AKP'ê li dijî hevşaredarên DBP'ê berdewam dike û heta niha nêzî 70 hevşaredarên DBP'ê ji peywirê hatin girtin û şandin girtîgehê. Herî dawî hevşaredarê Karazê Affullah Kar ê ji aliyê Waliyê Amedê ve ji peywirê hatibû girtin li mala xwe hat binçavkirin. Li gel Kar 3 kesên din jî di serdegirtina malan de hatin binçavkirin. Hevşaredar Kar û 3 kesên din bi îdiaya 'Endamê rêxistinê ne' birin Midûriyeta Polîsan a Karazê. AMED



## Kaya ji Afyonê anîn Amedê

Di çarçoveya lêpirsîna ku ji aliyê Serdozgerê Komarê yê Amedê ve tê meşandin Parlamentera HDP'ê ya Stenbolê Huda Kaya li Afyonê hatibû binçavkirin û piştî bi saetan li Balefirgeha Adnan Menderes a Îzmîrê hat rawestandin anîn Amedê. Di çarçoveya lêpirsîna der barê Kaya de hatiye vekirin, Kaya piştî îfadeyê bi şertê kontrola edlî hat berdan. Parlamentera HDP'ê ya Edeneyê Meral Daniş Beştaş jî di çarçoveya lêpirsîna Dozgerê Komarê ya Amedê li mala xwe hatibû binçavkirin. Piştî li dozgeriyê îfadeya Beştaş hat girtin, bi şertê kontrola edlî serbest hat berdan. AMED




## Li Ewropayê çalakî û meşa dirêj

**KAMPANYAYA 'AZAD BIKE' YA** ji hêla ciwanên kurd ên li Ewropayê ve hatiye destpêkirin berdewam dike. Ciwanên ku bi dirûşma "Em Rêber Apo azad bikin, Kurdistanê azad bikin û jiyana azad ava bikin" ketin rê, banga serhildan û şikandina tecrîdê kirin. Ciwanên kurd li Hannover afîşên ku wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ser û azadiya Ocalan tê xwestin li dîwaran dan. Ciwanan got ku ew bi dirûşma "Azadiya Rêbertiyê" dest bi çalakiyên xwe kirine û dê vê xebatê li gelemperiya Ewropayê bimeşînin. HANNAOVER

# Ocalan rola xwe lîst dora Barzanî ye

**Parlamentera HDP'ê ya Amedê Feleknas Uca bal kişand ser girîngiya kongreya neteweyî û aşkera kir ku Ocalan ji bo kongreyê rola xwe lîstiye û niha ew li bendê ne ku Barzanî jî peywira xwe bi cih bîne**






Parlamentera HDP'ê ya Amedê ya bi eslê xwe êzidî Feleknas Uca têkîldarî yekitiya neteweyî axivî û got ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo kongreyê rola xwe leyistiye û ew hêvî dikin ku Mesûd Barzanî jî rola xwe ya bo yekitiyê bileyze. Uca diyar kir ku di pêvajoya ku kurdan fersendekî mezin bi dest xistine de, yekitiya kurdan qasî nan û avê pêwîst e.

Uca destnîşan kir ku gelê kurd li Kobanê, Şengalê, Kerkuk û Misûlê rolên giring dilîze û wiha axivî: "Heta gelê kurd muxatap neyê girtin çareserî jî pêk nayê." Uca bal kişand ser yekitina neteweyî jî û got ku "Yekitina neteweyî qasî nan û avê pêwîst e" û wiha pê de çû: "Heger gelê kurd yekitiya xwe ava neke, êrîş jî dê bidome. Hêzên serdest jî ji bo sed sal din jî gelê kurd di nava koletiyê de bihêlin. Li hemberî bê statuyê yek dermanê gelê kurd heye ew jî yekitiye."

**FIRSENDA DÎROKÎ**

Uca piştrast kir ku heke yekitî hebûya êzidî ji 74 fermanan derbas nedibû û aşkera kir ku dive gelê kurd kongreya neteweyî li darbêxe û bi hêza xwe li hemberî van polîtîkayan bisekine.

Uca anî ziman ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo pêk anîna kongreya neteweyî kedên mezin daye û wiha axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Dive îro birêz Mesûd Barzanî jî rola xwe bi cîh bîne. Em dikarin bibin yek. Heger kurd di vê pêvajoyê de yekitiya xwe pêk neyîne, fersenda dîrokî ji dest diçe." *AMED - DÎHABER*

## 'Zextan li Tirkiyeyê bikin'

Endamê Kongreya Afrîkaya Başûr Ebrahîm Ebrahîm diyar kir ku ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan divê civaka navneteweyî zextê li dewleta tirk bike. Ebrahîm da xuyakirin ku destûra bingehîn jî li gorî vê rastiyê hatiye amadekirin û ev tişt got: "Mîna gelê Kurdistanê me jî ji bo azadiyê şer dikir. Lîderê me Nelson Mandela demek dirêj li Girava Robenê girtî ma. Dema li girtîgehê bû, bi rejîma Apartheîdê re dest bi danûstandinan kir. Serokwezîrê wê demê Frederik Willem de Clark, li ser rê û rêbazên çareseriyeke kûr bi Mandela re axivî."

Ebrahîm bi bîr xist ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî li girtîgehê ye û aşkera kir ku wan ji hikumeta tirk xwestiye ku bi birêz Ocalan re meseleyê bi rêya aştiyê çareser bikin û ev tişt got: "Abdullah Ocalan hemfikir e ku pirsgirêk bi rêya danûstandinan çareser bike. Ji bo vê jî ket nava hewldanan. Ji bo Tirkiyeyê bike welatekî xweştir, pêşniyarên wî hebûn."

Ebrahîm aşkera kir ku divê Ocalan bigihêje azadiya xwe û piştrast kir ku divê ji bo azadiya Ocalan zexta civaka navneteweyî jî derkeve pêş û di vî alî de zext li serokomarê tirk Erdogan bê kirin û tecrîd ji holê bê rakirin. *BRUKSEL - ANF*

## Ji bo Ocalan li Osloyê meşiyan



Tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev 18 sal e berdewam dike û ev qasî 5 salan e Ocalan nikare bi parêzerên xwe re hevdîtinê pêk bîne û herî dawî di 11'ê îlona 2016'an de piştî gelek siyasetmedarên kurd li Amedê ji bo Ocalan ketin greva birçîbûnê, dewlet neçar ma Mehmet Ocalan bişîne Îmraliyê.

Ji wê rojê vir ve tu hevdîtin bi Ocalan re nehatiye kirin û bertekên gelê kurd jî her roj diçin zêde dibin. Herî dawî di pêşengiya Navenda Civaka Demokratîk a Kurd li Oslo û Komeleya Ciwanan (UNGKURD) ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li paytexta Norvecê li Osloyê meşek bi meşaleyan hat lidarxistin.

Çalakvanên li ber avahiya parlamentê mîtîngek li darxistin û li ser navê UNGKURD'ê Rojhat Algunerhan axivî û bal kişand ser rola Ocalan a ji bo gelê kurd û ev tişt got: "Em ciwan qebûl nakin ku serokê me di girtîgehan de be. Ji bo azadiya Serok çi ji destê me bê em ê bikin." Algunerhan bang li ciwanên kurd kir ku di 18'e sibatê de beşdarî meşa ji bo azadiya Ocalan a li Osloyê bibin. *OSLO - ANF*

## Mêrek li şûna jinê peywirdar kirin

Piştî ku Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê ji aliyê qeyûm ve hat dagirkirin, di destpêkê de xebatkara Midûriyeta Tenduristiyê Mehtap Bîngul li Serokatiya Daîreya Polîtîkayên Jinê ya Şaredariyê hat bicihkirin. Piştre jî li şûna Mehtap Bîngul, pismamê wê Abdurrahman Bîngul ku li Midûriyeta Tenduristiyê dixebitî, li Serokatiya Daîreya Polîtîkayên Jinê weke midûr hat bicihkirin.

Femînîst û hiqûqnas Hulya Gulbahar ev yek weke rewşeke 'trajîkomîk' bi nav kir.



Gulbahar bal kişand ser peyama bi vê yekê re dixwaze bê dayîn û got ku "Peyam diyar e: Hemû biryarên têkildarî jinan em mêr didin, em hemû polîtîkayan diyar dikin û bi cih tînin; divê jin zêdegaviyê neke, di nava desthilatdarî û fermana mêr de bixebitin'. Ji bo ev hewldana trajîkomîk bê temamkirin, ya wê hemû xebatkarên vê daîreyê bikin mêr, yan jî wê midûriyetê bi temamî bigirin."

Gulbahar destnîşan kir ku bi girtina komeleyên jinan, binçavkirina aktîvîstên jin bi hincetên pûç û vala pêk tên û wiha pê de çû: "Di Rewşa Awarte de, dixwazin jinan bêdeng bikin. Lê em ê têkoşîna xwe bidomînin." *MÊRDÎN - ANF*

www.arsivakurdi.org

# Dê bi hikmeta Xizir bêjin ‘Na’

**Li hemberî hewldana guhertina rejîma Tirkiyeyê gelê elewî jî dê ‘na’yê bi rêxistin bike. Nûnerên saziyên elewiyan helwesta xwe wiha tînin ziman: “Em ê di vê meha xêrê de bi hikmeta Xizir bibêjin ‘na’.”**

Nûnerên sazî û komeleyên elewiyan dan zanîn ku ew ê di referandûma guhertina qanûna bingehîn a ku AKP û MHP dixwaze rejîmekê nû li Tirkiyeyê bidin avakirin re bibêjin ‘Na’. Nûneran elewiyan dan zanîn ku ew ê di vê meha xêrê de bi hikmeta Xizir bibêjin ‘Na’.

Têkildarî mijarê Hevserokê Şaxa Komeleya Elewiyên a Demokratik (DAD) ya Stenbolê Bulent Felekoglu diyar kir ku ew ê karekî xêre bikin û bêjin ‘Na’. Felekoglu got ku divê her kes ji bo xêra Tirkiyeyê bêje ‘Na’ û rengê Tirkiyeyê yê heyî bi parêzin. Felekoglu da zanîn ku ew ê di meha Xizir de bi Hikmeta Xizir re xêrê bi rêxistin bikin û ji bo Xêrê bêjin ‘Na’.


Sevîm Yalincakoglu


Bûlent Felekoglu


Zeynel Odabaş

**BIRYARA ELEWIYAN**

Sekretera Rêxistina Jinê ya Federasyona Elewiyên Bektaşî (ABF) Sevîm Yalincakoglu jî destnîşan kir ku ji dîroka komarê heta niha elewî her dem yek dengin û wiha domand: “Em li hemû sazî û dezgehên elewiyan geriyan. Hemû yek deng in. Heta niha tu kesî ne gotiye ‘Erê’. Hemû elewî bi yek dengî dibêjin ‘Na’. Em ê sedemên çima ‘Na’ yê bi herkesî re vebêjin û wan bi rêxistin kirin.”

**PEYWIRA HER KESÎ**

Sekreterê Rêxistina Giştî yê Federasyona Elewiyên Bektaşî (ABF) û Serokê Cemxaneya Sultangazî Pîr Sultan Abdal, Zeynel Odabaş jî nêrînên xwe wiha anîn ziman: “Di referandumê de gotina ‘Na’ yê ne tenê peywîra elewiyan e. Divê her kes bibêje ‘Na’. Ji bo parastina demokrasiyê divê her kes bêje ‘Na’. Em ê ji bo pêşeroja xwe bêjin ‘Na’.” ***STENBOL***



## ‘Her ‘erê’yek mirinek e’

**BI QEBÛLKIRINA** pêşnûmeya guhertina qanûna bingehîn di meclisê de, rêya referandumê hat vekirin. Li hemberî vê hewldana guherandina rejîmê jî herî zêde jin bi bertekin. Der barê mijarê Hevseroka Giştî ya ESP’ê Çîçek Otlu anî ziman ku di referandumê de her ‘Erê’ yek mirineke.

Çîçek Otlu anî ziman ku li dijî hewldana guherandina qanûna bingehîn divê di serî de jin bi awayekî xurt li ber xwe bidin û wiha dom kir: “AKP di nava 15 salan de her tim xwestiye mafên jinan xesp bike û wan ji her qadekê winda bike. Ev rêbazê wan li dijî hemû hêzên muxalîf e.”

**KIRYARÊN AKP’Ê**

Di dawiyê de jî Otlu ev nirxandin kir: “Kuştina jinan di dema AKP’ê de ji sedî hezar û 400 zêde bû. Divê jin li hemberî daxwaza AKP’ê ya dibêje ‘Erê’ bibêjin ‘Na’. Em dixwazin bêjin ku her ‘Erê’ yek tê wateya mirinek ê. Divê bi têkoşîna hevpar eniya ‘Na’ yê were xurtkirin.” **AMED- ŞÛJIN**

# Qanûna 12’ê Îlonê xurt dikin

Endamê Lijneya Serokên ODP’ê Alper Taş diyar kir ku wan dest bi rêxistinkirina eniya ‘Na’yê kiriye û da zanîn ku ew ê hewlbidin derdorên ku di bin bandora AKP û MHP’ê de mane qaneh bikin.

Partiya Azadî û Piştevaniyê (ODP) û Partiya Tevgera Kedkaran (EHP) dest bi rêxistinkirina eniya ‘Na’yê kirin. Der barê mijarê Alper Taş anî ziman ku qedera welatekî divê teslimî kesekî neyê kirin û wiha dom kir: “Ev qanûna bingehîn ku AKP-MHP tîne, li ser vîna gel hegemonyayê tesîs dike û hemû derdorên civakî red dike. ji ber vê yekê jî em dê di referandûmê de bibêjin ‘Na’.”

**DERDORÊN AKP’Ê**

Taş da zanîn ku dê rejîma 12’ê Îlonê bi pergala serokatiyê re xurtir bibe û wiha pê de çû: “Qanûn çêkirin, birêvebirin û daraz bi her awayî dikeve bin destê serokkomar. Ev tê wateya temamkirina felsefeya 12’ê Îlonê. Em ji vê dîktaya yekzilamî e dibêjin ‘Na’. Divê her kes ji bo ‘Na’ yê bi xebite û birêxistin bike. Bi taybetî jî divê em derdorên nêzî AKP ûy MHP’ê qanih bikin.”

**DÊ KÊ QANIH BIKIN?**

Seroka Giştî ya EHP’ê Sibel Uzun jî got ku pêdiviya wan ne bi serokatiyê, bi demokrasî, azadî, birêvebirina parlementoyî û pêşeroja welat heye û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Divê em niha jî kampanyayeke mîna ‘Em ê te nekin serok’ bê destpêkirin. Divê bi taybetî jî em kesên bêbiryar qaneh bikin. Divê em mijarên mîna aborî, bêkarî, cinayetên jinan û rejîma yêkzilamî baş vêbibêjin. Di dest me de çi derfet hebin divê em seferber bikin.” ***STENBOL - DÎHABER***

## Dê rê nedin rejîma dîktatoriyê




Hevserokê Giştî yê SYKP’ê Ahmet Kaya li ber navenda giştî ya partiya xwe daxuyanî da û diyar kir ku ew ê ‘Na’ yê bi rêxistin bikin.

Endam û rêveberên Partiya Rizgariya Ji Nûve Sosyalîst (SYKP) li ber navenda giştî ya kolana Kizilayê kom bûn û daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de girseyê pankarta ‘Ji faşîzmê û dîktatoriya yek mirovî re bêjin Na’ vekiribûn û dirûşmeyên ‘Bi tena serê xwe rizgarî tune ye. An bi hev re an ne tu kes’ û ‘Li dijî faşîzmê mil bidin milê hevdu’ berz kirin. Di daxuyaniyê de endam û rêveberên SYKP’ê diyar kirin ku ew dê di referandumê de ji qanûna bingehîna nû re bibêjin ‘Na’.

**LÎSTIKA ERDOGAN**

Serokê Giştî yê SYKP’ê Ahmet Kaya di axaftina xwe de der barê îdiaya Erdogan a di got; ‘Bi vê qanûnê rejîm nayê guhertin’ de axivî û wiha domand: “Guhertina pergalê ji xwe tê wateya guhertina rejîmê. Niha bi hezaran bi ‘îdiaya heqaretkirina Erdogan’ tên girtin. Qesr, hemû hêzên muxalîf jî weke ‘Terorîst’ bi nav dike û dide girtin. Divê hemû kesên têkoşîna mafên mirovan, demokrasî, aştî, hiqûq û edaletê didin li dijî vê pergalê bêjin Na. Em ê bi gotina ‘Na’yê vê pergala dîktatoriya qebûl nekin.” ***ENQERE - DÎHABER***


## Giloka ‘na’ yê mezin dibe

Gelek akademîsyen, nivîskar û hunermendan diyar kiribûn ku dê di referandumê de bêjin na. Li ser vê yekê giloka ‘Na’ yê her ku diçe mezin dibe. Giloka kampanyaya ‘#MemleketİçinHAYIR’ a Tevgera Hezîran a Yekbûyî jî her ku diçe mezintir dibe.

Bi hezaran akademîsyen, siyasetmedar, nivîskar, rojnameger û hunermendan helwesta xwe ya li dijî guhertina Qanûna Bingehîn anîn ziman û diyar kirin ku dê di referandumê de bêjin Na. Li ser vê yekê kampanyayên ji bo ‘Na’ yê wekî giloka berfê her ku diçe mezintir dibe. Tevgera Hezîran a Yekbûyî li ser hesabê medyaya civakî kampanya ‘#MemleketİçinHAYIR’ (Ji bo welat Na) dan destpêkirin. Di çarçoveya kampanyayê de hemû sedemên ‘Na’ yê ji gel re tê vegotin û her ku diçe jî ev kampanya mezintir dibe. Ev kampanya heta niha ji hêla bi dehezaran ve hatiye belavkirin. **AMED - DÎHABER**

**Fanos**

## Çima ‘Na’?


M. Emîn Yildirim

Desthilatdariya dîktator a Erdogan û AKP’ê ji hewldana darbeya 15’ê Tîrmehê baş îstifade kir û ev yek kir sedem ku dijderbeyekê pêk bîne. Rewşa Awarte îlan kir, welatek bi biryarnameyên di hikmê qanûnan de bi rê ve dibe û tifaqa xwe bi partiya faşîst MHP’ê re di asteke fermî de bi pêş xist. Ev qanûnên ku ji aliyê AKP’ê û MHP’ê bi lez û bez hatine derxistin bi temamî xizmeta dîktatoriya Erdogan dikin. Esas sedema ku Erdogan û AKP çima di sîstema serokomariyê de israr dikin tê zanîn. Bi rastî jî tirsek wan a mezin heye. Taybet talankirin, xerabkirin û wêrankirina bajar û navçeyên Kurdistanê, ew komkujiyên pêk tên, girtina bi hezaran însanan, dîsa li ser civaka Tirkiyeyê, hêzên azadîxwaz, demokratîk û sosyalîst zext û zordariya bi pêş xistin û ji ber gelek bûyerên din Erdogan baş dizane ku muheqeq dê hesabê vê komkujî û faşîzma bi pêş xistiye jê bê pirsîn.

Du rê li pêşiya Erdogan û AKP’ê bûn. Erdogan an dê desthilatdariya xwe xurttir bikira û qanûnên ku jê re xizmetê dikin ji parlamentoyê derxistana yan jî dê tasfiye bibûya û nekariya ji hesabpirsîna dada neteweyî û navneteweyî bireviya. Sedema lezgînbûna Erdogan ev e.

Ev qanûnên ku bi MHP’ê re ji parlamentoyê derxistin bi temamî qanûnên faşîst û dîktatoryal in. Li hemberî civaka bêrêxistinkirî ya demokratîk û azadîxwaz, hêzên sosyalîst û di serî de gelê kurd dê bi van qanûnên derxistine li her qada jiyanê zext û zordariyeke hîn dijwartir pêk bînin. Yanî wisa bikin ku tu kes nikaribe bêhnê hilde û bistîne û bê nefes bihêle.

AKP û MHP dê van qanûnan bibin referandûmê. Li dijî van qanûnan helwestek bê diyarkirin pirr muhîm e. Yên ji referandûmê re bêjin ‘erê’ tê zanîn ku bi temamî ew ê xizmetê ji dîktatoriya Erdogan re bikin. Li beranberî vê yekê yên li dijî dîktatoriyê îdeolojî, reng, cins û çîna wan her çi be pêwîst e ku helwesta xwe bikin yek, ji xwe bawer bikin û xwedî biryar bin ku bikaribin rê li ber faşîzm û dîktatoriya Erdogan bigirin. Ev ji yên ku di referandûmê de bêjin ‘na’ ne. CHP jî li gorî xwe ew ê bêje ‘na’. Lê helwesta CHP’ê ku îdeolojiya fermî û esas dewletê temsîl dike tê zanîn. Hêzên derveyî CHP’ê weke gelê kurd, tevgerên sosyalîst, azadîxwaz û demokratîk bi perspektîfekê li dijî faşîzmê divê eniyeke demokratîk bi rêxistin bikin û bêjin na.

Eger rê li pêşiya dîktatoriya Erdogan bê girtin mirov dikare bêje ku desthilatdariya AKP û Erdogan ew ê ber bi têkçûnê ve biçe. Her wiha riya demokratîkbûna Tirkiyeyê û derfetên çareserkirina pirsgirêka kurd ew ê derkevin holê. Lê di referandûmê erê encam bigire ew jî tê wateya ku faşîzm bi her awayî xwe ew ê xwe bi rêxistin bike û xeteriya vê jî tê zanîn.

Rast e, AKP û Erdogan ji bo di referandûmê de encamê bigire ew ê hemû derfet û hêza dewleta, zexta psîkolojîk û îmkanên madî bi kar bînin. Lê eger potansiyela heyî ya li dijî dîktatoriya Erdogan birastî baş bi rêxistin bikin û baş bixebitin,ne mimkûn e ku Erdogan, AKP û MHP di vê referandûmê de karibin encamê bigirin. Ev referandûm pirr muhîm e. Eger îradeya faşîzma Erdogan û AKP’ê têk biçe û bişikê ew ê guhertinên bingehîn li Tirkiyeyê çêbibin.

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
29 Çile 2017 Yekşem



***Fermandar Helwest Partîzan li dijî qirkirina li dijî gelê kurd bi dehan salan di nava tevgera azadiyê de tê koşiya. Fermandar Partîzan li gelek herêmên Kurdistanê têkoşîneke bêeman dimeşîne û li Bagokê şehîd dibe***

# Rêwingê 21 salan: Helwest Partîzan

BAHOZ AMED / BEHDÎNAN - AMED

Helwest Partîzan ku wek şoreşgerekî jiyana xwe ya 21 salan a gerîlatiyê diyarî azadiya gelê kurd kir, di serî de li bakurê Kurdistanê li gelek qadên gerîla tê koşiya û cihê xwe di nava şoreşgerên başûrê Kurdistanê de ku jiyana xwe ji dest da, girt.

Yek ji fermandarên HPG'ê yên ji başûrê Kurdistanê Hîwa Hamît bi nasnav Helwest Partîzan, di sala 1982'yan de li bajarê Silêmaniye yê başûrê Kurdistanê di nava malbateke welatparêz de ji dayik bû. Rejîma Baasê ya Iraqê, piştî sala 1988'an bi polîtîkaya Enfalê dixwaze gelê kurd ê li başûrê Kurdistanê tune bike. Piştî komkujiya Helebçeyê, zextên li ser gelê kurd zêde dike. Di wê demê de mîna gelek malbatên kurd, malbata Helwest Partîzan jî neçar dimîne ku di destpêka salên 1990'î de koçî Hewlêrê bike. Civaka başûrê Kurdistanê di wê demê de di nava şerekî giran de ye. Helwest Partîzan heta dibistana navîn dixwîne. Di nava rewşekê de ku êşên Helebçeyê hêj zindî ne, bi rastiya neteweya xwe û dijmin mezin dibe.

**DESTPÊKA LÊGERÎNÊ**

Helwest li dijî van komkujiyên li gelê kurd tên kirin, dixwaze tiştekî ji bo gelê xwe û Kurdistanê bike. Agirê azadiyê mohra xwe li dema ciwantiya wî dixwe û Partîzan di vê demê de dikeve nava lêgerînekê. Sala 1992'yan dema şerê Başûr e. Pismamê Helwest tev li nava refên PKK'ê dibe. Helwest jî bi vê yekê re têkoşîna azadiyê ya kurd nas dike. Di sala 1995'an de dixwaze tev li nava refên PKK'ê bibe. Lê belê ji ber ku emrê wî hingî biçûk e, tevlîbûna wî nayê qebûlkirin. Helwest Partîzan piştî ku birayê wî di sala 1996'an de tev li nava PKK'ê dibe, dixwaze careke din şansê xwe biceribîne û tev li nava refên gerîla dibe. Di meşa xwe ya çiyê ya 21 salan de, di serî de li Xakurkê, Zagros, Zap, Amed, Garê, Garzan, Dêrsim û Mêrdînê li gelek çeperên çiyayên Kurdistanê gerîlatiyê dike.

**HIŞÊ NETEWEYÎ**

Helwest Partîzan, di dema operasyona tunekirinê ya dewleta tirk a bi navê 'Operasyona Sandîvîç' de ku li başûrê Kurdistanê meşand, li qada Xakurkê gerîla bû. Partîzan gelekî hêrs dibe ku PDK di vê operasyonê de cihê xwe li gel dewleta tirk digire. Ev yek dibe sedem ku sala 1997'an ji bo Partîzan bibe sala pêşveçûna hişmendiya neteweyî ya kurd.

**BERSIVA PARTÎZAN**

Helwest Partîzan heta sala 2002'yan li Herêmên Parastinê yên Medyayê tê dikoşe. Di heman salê de berê xwe dide Amedê. Partîzan di sala 2006'an de li başûrê Kurdistanê vedigere û ji bo ku bibe bersiv ji tecrîd û êrîşa jehrkirinê ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat kirin, di sala 2008'an de careke din vedigere Amedê. Di serdemeke bi vî rengî de ku şerê gel ê şoreşgerî û çalakiyên gerîla bi xurtî dihatin meşandin, Partîzan di asta pêşengiyê de tev li têkoşîna gerîla bû. Li Dêrsimê bi çalakiyên xwe û bi jiyana xwe, ruhê serdemê diparast.

**ŞEHADETA HELWEST**

Dewleta tirk di 24'ê tîrmeha 2015'an de li dijî Tevgera Azadiyê ya Kurd û gelê kurd dest bi operasyonên tunekirinê dike. Di van operasyonan de, êrîşî berxwedana xwerêveberiyê ya li Kurdistanê bi taybetî li Gimgim, Cizîr, Şirnex, Sûr û Nisêbînê kir û xwest gelê kurd tune bike. Li hemberî van êrîşên dewleta tirk, ji bo berxwedana dîrokî û rûmetê ya gelê kurd, mîna hemû gerîlayan dixwaze derbasî bakurê Kurdistanê bibe û tev li vê berxwedanê bibe. Partîzan bi vê daxwazê di sala 2016'an de diçe herêma Mêrdînê. Di nava gelek çalakiyên li dijî artêşa tirk de cihê xwe digire. Di 19'ê mijdarê de, li herêma di navbera gundên Sirincak û Kutbê yên li herêma Bagokê ya Mêrdînê de, li dijî artêşa tirk di şer de tevî hevrêyê xwe Zafer Bagok jiyana xwe ji dest dide.

Helwest Partîzan ku şoreşgerekî rasteqîn bû, bi rojnivîsa xwe ya li herêma Dêrsimê nivîsand, rêya gerîla ronî dike. Gelek nivîs, gotar, helbest û bîranîn nivîsandin. Partîzan piştre hînî zimanê tirkî dibe û bi navê 'Topragin Gelîni' (Bûka Axê) romanekê jî dinivîse.

## Kesayetekî mînak


**HELWEST PARTÎZAN** ku pîvanên exlaqî û hevgirtina PKK'ê bandor lê kiribû, di meşa gerîlatiyê ya 21 salan de, her bi coş bû. Partîzan bi sekna xwe, bi kesayetiya xwe, bi jiyan û têkoşîna xwe bû kesayetekî mînak. Bi hêz û moralê ji aliyê her kesî ve dihat naskirin. Jiyana xwe fedayî gelê Kurdistanê kir û bi bawеriya bi Têkoşîna Azadiyê ya Kurd jiya.




**JI FERMANDARÊN** HPG'ê Helwest Partîzan di nava têkoşîna gerîla de li herêmên mîna Amed, Dêrsim û Mêrdînê bi erkên gelekî girîng rabû. Bi tecrube û hunera xwe, fermandarekî xurt bû. HPG'ê li ser Partîzan wiha digot: "Hevalê Helwest dizanîbû ku mîlîtanbûyîn ew e ku di nava her şert û mercî de jiyana li ser xeta Apoyî. Herî dawî di nav Fermandariya Eyaleta Mêrdînê de bi erk û berpirsyariyê rabû. Di şerê gel ê şoreşgerî de li dijî dagirkeriyê şerekî bêeman meşand."

Neqew

# Ethos


Ulaş Guldîken

Ethos an jî ji yek wateyên wê xislet. Di dirbeke wê ya din de gava karakter were gotin wisa dixuye ku ji aliyê bikaranîna formasyona zimên ve hêj bêtir dê were fehmkirin. Wekî din em bi hinek peyvên din jî rewşê dikarin firehtir bikin. Dibe ku her yek bi her awayî xwe li ser a din nedabe rûniştandin lê avahiya peyv û rehên wê reseniya xwe derdixe der. Lewre yek ne jî ya din kêm e ne jî zêde ye. Mînaka mijarê, peyva xû jî li vir karê me dibîne. Gava were gotin, karakter, xûy an jî xislet her yek qala hêmanên avahiyekê dikin ku carinan ew bedenek, carinan exlaqek, carinan çandek û hwd. in. Ev her sê wekî mînakên din ji aliyê dîrokê ve diyardeyên ku temambûyî nîn in. Lewma hêj teşe digirin, hê diguherin û di wateyeke wisa de dibe ku ji halê xwe yê berê ji bînî ve vala jî bibin. Bi gotineke din ew wek entelektueliya ku gihaştiye hemû encamên xwe nîn in ku dawî lê hatibe û êdî neguhere.

Ev her sê wecên ku beramberî hêmanekê ne, gava dibin mijar gelo em dibêjên ka bingehên wan çi ne yan jî ji ku derê hatine? Em kesekî/ê dikarin ji ber karakterên wî/ê her carê ewilî bidarizînin û dûre pê re bikevin nava têkiliyê? Ewil, ji ber xisletên ku guncivandine gelo ew kes tê hundirandin an em wî/ê wek xwe dipejirînin û li pey wê, cudahiyên ku di nav xwe de veşartine derdikevin der û ji ber van nûnertiya hemû paşxaneya xwe dikin. Di hemû nimanên me de cerebeyên nifşan û xisletên me bi xwe hilgirtiye ser xwe, xwe didin der.

Niha, ku em peyvên xwe bi beramberiya wê ya "ethos"ê ve girê bidin rewşeke balkêş derdikeve. Di heman demê de ev peyv ji bo kevneşopiyê jî xwedî wate ye. Kevneşopî jî di nav de gelo ev hemû hêman xwe dispêrin kîjan resenî yan jî kokan? Balkêşiya peyvê di wecên xwe yên din de ye. Lewma zanatiya bikaranîna wê di heman demê de bi demê re wateyên xwe yên din jî hilgirtine. Ethos, li cem van, di wateya şikeft, stare û hêwirgehê de ye jî. Di serencama şaristaniyê de tê zanîn ku beriya mirovan hin sewal hene ku xwedî stare û şikeftên ku bûne hêwirgeh in. Mirov jî her ku ber bi teşeya xwe ya îro ve hatiye ji van cerebe û deskeftiyan jî xwe re par derxistine û kirine xislet. Bi demê re yan wek wan an jî bi encamên ji çavdêriyan derketine ji xwe re cih çêkirine û li ser bûne niştecih. Carinan jî li cihên ku beriya wan ji aliyê hinek sewalan ve hatiye bikaranîn –bi giranî şikeft- bûne xwedî stare. Li vir peyv di wateya xwe de balkêş e ku jê re gotine 'stare'. Çimkî jê re cihek lazim e ku wî/ê bistirîne.

Ev şikeft, stare, hêwirgeh çawa ku wek beramberî peyva "ethos" xwedî wate ne, karakter, xûy û xislet jî ji wê dertên.

Diyar e ku gava qala karaktera kesekî/ê dibe em wî/ê jî hinek hêmanên deskeftiyên wî ku xwe dispêrin cih, war, erdnigarî û hwd. şîrove dikin.

Ew her çi qas bi xisletên xwe yên çandinî, exlaqî yan jî laş û kevneşopiyan ve li ber çavan be jî nayê wê wateyê ku ev wek hilberînên tenê bi destê mirovan in. Kes, gava dibe xwediyê/a 'ethos'ekê li paş xwe şopên şikeft û stareyan, bêhna sewalên beriya wan lê bûne niştecih jî datînin.

www.arsivakurdi.org

## Wêneyek ji sedsala 19'emîn

**KURD, HEZARAN SALAN E** li Rojhilata Navîn têkoşîna jiyanê didin û wekî gelek civakên li ser vê erdnîgariyê ew jî xwedî çandeke rengîn in. Ev cil û bergên di vê wêneyî de tên dîtin, ji nîvê serdema duyemîn a sedsala 19'emîn e. Kesê li milê rastê kurdekî bi cil û bergên xwe yên Mezopotamyaya Jêrîn, ê navê kurdekî ji Mêrdînê û yê milê çepê jî kurdekî ji Amedê ye. Kurd bi cil û bergên xwe yên gelêrî, hem mêr û hem jî jin balê dikêşin ser xwe. Ji ber polîtîkayên dagirkirinê yên li Kurdistanê, li gelek herêman dibe ku cil û bergên kurdan şibiyabin cil û bergên neteweyên cuda, lê hêj li hêla Riha, Amed, Botan, Serhed û hwd. cil û bergên kurdan gelêrî tên bikaranîn. Piştî pêşketina têkoşîna azadiyê, êdî cil û bergên gerîlayan jî tên lixwekirin. **AMED**



## Derûniya Dîktatoriyê




Nivîskar Fathalî M. Moghaddam ê bi eslê xwe ji Îranê û welatiyê Amerîkayê ye, di pirtûka xwe ya bi navê 'Dîktatorlugun Pîskolojîsî' (Derûniya Dîktatoriyê) de, balê dikişîne ser pêkanîn û êşên ku dîktator bi mirovahiyê didin kişandin. Pirtûk bi çapa xwe ya duyemîn ji Weşanên 3P derket. Derûnnas Prof. Dr. Ozcan Koknel têkildarî vê pirtûkê dibêje: "Vê serdema ku em tê de dijîn, gelek guherînên gerdûnî pêk tên. Divê hemû kesên ku di aliyê demokrasî û mafên mirovan de fikarên wan hene, di arşîva xwe de cih ji vê pirtûkê re veqetîne û bixwîne." **AMED**

## Li Helebçeyê mîhrîcana çandê



Li bajarê Helebçeyê bi armanca nasandina çand û hunerê, Sêyemîn Mîhrîcana Dengên Ciyawaz hat sazkirin. Mîhrîcan li Salona Boneyan a navçeya Şaresûra Helebçeyê, bi beşdarbûna 12 hunermend, komên cuda û helbestvanên ji çar parçeyên Kurdistanê pêk hat. Hunermend Erselan Hewramî der barê mîhrîcanê de axivî û diyar kir ku xwestiye bi cil û bergên hewramî beşdarî mîhrîcanê bibe û peyama gelê Hewraman bigihîne hemû aliyên Kurdistanê. Mîhrîcana ku bi armanca danasîna çand û hunerên ciyawaz ên hemû beşên Kurdistanê hat organîzekirin, yekemîn car e Şarezûr mazûvaniya mîhrîcanê dike. Rêveberê Çand û Hunera Şarezûrê Merîwan Tofîq jî got ku parçebûna Kurdistanê ne bi daxwaz û îradeya gelê kurd bûye û wiha pê de çû: "Em hewl didin bêyî naskirina sînoran, çand û hunera dewlemend a hemû parçeyên Kurdistanê bidin nasandin û gelê me çanda neteweyî ji nêz ve nas bike." Stranbêjan bi stranên xwe, komên govandê jî bi govendên xwe û helbestvanan jî bi helbestên xwe mîhrîcan rengîn kir. **HELEBÇE**

# Ez ku îro pir xemgîn im lê yarê...

**Her stran û kilameke kurdan destan û bûyereke dilşewat a gelê kurd vedibêje. Çîroka strana 'Lê Yarê' ya ku bi peyvên "Ez ku îro pir xemgîm in lê yarê, gulnarê" jî yek ji bûyerên dilşewat ên jinên kurd e**



## Yelda û Mîrzazade bi hev re dibêjin

**EV STRANA** ku balê dikişîne ser vê hovîtiya tirkmenan, di demên dawîn de ji hêla Yelda Abbasî ve hat gotin. Yelda bi xwe jî ji kurdên Xoresanê ye û ev stran li gorî meqamên stranbêjên berê gotiye. Stranbêjê mêr ê bi Yeldayê re di stranê de deng dide jî Mohsen Mîrzazade ye. Gotinên stranê wiha ne:

Lê Yarê
Ez ku îro pir xemgîn im lê yarê
Lê yarê gulnarê
Çav li bîna negerînim lê yarê
Lê yarê hevalê
Nîşan ji te ez nabînim gulnarê
Nîşan ji te ez nabînim gulnarê
Derdê dilê min korî ye lê yarê
yarê gulnarê
Xosan canê min xwariya lê yarê
Lê yarê hevalê
Dîdar maye qiyametê gulnarê
Dîdar maye qiyametê gulnarê

Ceylan kuştin jinan birin lê yarê
Lê yarê gulnarê
Gulnara min hêsîr kirin lê yarê
Lê yarê hevalê
Wan firotin li kuçe û bazarê
Ez ku îro pir xemgîn im lê yarê
Lê yarê gulnarê
Çav le bîna negerînim lê yarê
Lê yarê gulnarê
Nîşan ji te ez nabînim gulnarê
Nîşan ji te ez nabînim gulnarê



NAVENDA NÛÇEYAN

Piştî Kurdistan ji hêla hêzên navneteweyî yên wekî Brîtanya, Fransa, DYA û hwd. ve hat parçekirin û li welatên Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriyeyê hat parvekirin, li gorî her welatekî dagirker polîtîkayeke taybet li dijî gelê kurd hat meşandin. Ji cil û bergên kurdewar bigire heta muzîkê, ji hunerê bigire heta ziman, hema bêje tu nirx û kevneşopiyeke gelê kurd nehiştin û hemû bi rêyên werger û guhertina naverokê li gorî çand û zimanê xwe sererast kirin.

**NE JI PKK'Ê BE…**

Kurdên li dijî vê polîtîkaya taybet û faşîzan tê koşiyan û li ber xwe da jî bi dehan caran ji komkujiyan re hatin derbaskirin û tişta anîn serê gelê ermenî, bi heman şiklî li dijî kurdan jî dan meşandin. Di roja me ya îro de jî ev polîtîkaya qirkirin û fîzîkî bi hemû hovîtiya xwe tê meşandin. Lê gelê kurd bi têkoşîna 40 salên dawîn a di rêbertiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û tevgera azadiyê PKK'ê de tê meşandin, beşeke van gef û komkujiyan ji holê da rakirin. Lê hêj ev gefa komkujiyên dewleta tirk û hevkarên wê bi tevahî nehatiye wêderkirin. Heke rêxistineke wekî PKK'ê nebe, ev hêzên mijara gotinê di kêliyê de kurdên xwedî li çand û nasnameya xwe derdikevin, dê ji holê bidin rakirin.

**'KURD DIKARIN BILORÎNIN'**

Gelê kurd ê ku di tevahiya dîrokê de di aliyê çand, ziman, huner, muzîk û wêjeyê de xwe bi pêş xistiye, di 200 salên dawîn de ji ber van polîtîkayên qirkirinê, êş û azarên gelekî mezin kişandin û ji çanda xwe gelekî xerîb ketin. Ji bo ku kurd ji xwe dûr û xerîb bikevin, dîroka wan hat tunekirin. Gelek bûyerên destanî ji holê hatin rakirin. Ji kurdan re ji derveyî çanda gotin û dengbêjiyê tu tişt nehiştin. Jixwe neviyên osmaniyan ên îro di bin sîwana AKP'ê de hatine gel hev, ên wekî Ahmet Davutoglu gotinên wek "Em dihêlin kurd bi zimanê xwe bilorînin" tenê lorandina êşê layiqî kurdan dibînin. Kurdan gelek caran li ser keçên winda yên Dêrsim, Zîlan, Agirî, Helebçe, Amûdê, Mehabad, Şengal, bi dehan bûyerên din û li ser keçên dîlgirtî yên eşîra baçiyan hêsir barandin. Gelek ji wan bi rêya kilaman hatine gotin, jixwe kilama 'Lê Yarê' jî êşa van jinên kurd ên ku ji hêla tirkmenan ve hatine revandin, vedibêje.

**ÇÎROKA KEÇÊN KURD**

Herêma Xorasanê ji derveyî erdnîgariya Kurdistanê ye û nêzî 2 milyon kurd lê dijîn. Kurdên li vê herêmê zêdehî bi zaravayê kurmancî diaxivin. Kilama 'Lê Yarê' çîroka evîneke dilşewat a herêma Xoresanê vedibêje. Bi qasî ku tê zanîn ev stran çîroka bûyereke di sala 1905'an de vedibêje. Di 11'ê mijdara 1905'an de tirkmen bi ser navçeya Cenge Şîrvan a Îranê de digirin û 36 keçên kurd ên eşîra baçiyan dîl digirin. Gelek malên kurdan ên li navçeyê dişewitînin û hemû mêrên kurd tên qetilkirin.

**'LÊ YARÊ' Û EVÎNA WAN**

Tê gotin ku hin jinên ciwan ji hêla tirkmenan ve serbest tên berdan, lê hin jinan jî bi xwe re dibin û bi wan re dizewicin. Ev keç ji malbatên xwe dûr û wek koleyan tên bikaranîn. Ev strana 'Lê Yarê' ya ku bi zaravayê kurmancî hatiye gotin jî li ser evîna wan keçan hatiye gotin.

Stran ji hêla ciwanekî kurd ve hatiye gotin û ew kesê ev stran gotiye di şer de dîl tê girtin û piştre tê qetilkirin. Evîna wî jina ciwan Buhara jî li bajêr ji hêla çeteyên ku bi ser navçeyê de digirin û hemû kurdan qetil dikin ve tê firotin. Welatiyê bi navê Behman Şivanî yê ku şivantiyê dike, piştî du rojan hîn dibe ku welatiyên kurd dîl hatine girtin, vedigere gundê xwe û dibîne ku kûç li ser kûç nemaye. Tu kesî li wir nabîne. Her der hatiye rûxandin, her kes hatiye kuştin. Behman jî derdikeve ser girekî bilind û strana 'Lê Yarê' dibêje.

# Piştî şahiyê derketin paqijiyê

Pergala Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê di aliyê çalakî û xebatên ji bo zarokan de di nava hewldanên girîng de ye. Ji hêlekê ve saziyên ku zarokan di aliyê çand, ziman, muzîk û hwd. de perwerde dikin, ji hêlekê ve jî dibistanên ku bi salan e ji nirxên civakê dûr perwerde tê de tên dayîn, ji nû ve sererast dike û dixe xizmeta civakê. Herî dawî bi pêşengiya Nevenda Çand û Hunerê ya bajaroka Til Koçer, ji zarokên herêmê re çalakiyên hunerî hatin organîzekirin.



Bi armanca pêşxistin û xurtkirina jêhatiyên zarokên herêmê, ev çalakî tên organîzekirin. Zarokên endamên komên hunerî û bi dehan zarokên bajarokê di çalakiyê de hatin gel hev û bi hev re kêliyên rengîn derbas kirin û bi vê rêyê hev du jî nas dikin.



Di şahiyê de ne tenê stranên civakên cuda, zarokan stranên bi zimanê erebî û dîlanên gelêrî yên erebî jî pêşkêş kirin. Di dawiya şahiyê de, bi armanca pêşxistina çanda paqijiyê zarok bi dirûşma 'Paqijî xweş e' li kolanên bajarokê meşiyan û pankartên 'Paqijiyê biparêzin', 'Paqijî ji baweriyê ye' û 'Welat neke metirsiyê û parastina paqijiyê bike' li kolanan hatin daliqandin.

***GIRKÊ LEGÊ - ANHA***

# Rayber Apo omidê heme şaran o

ANDOK KERBORAN / ŞENGAL - ANF

Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ser de 18 serrî yo ke tecrîdêko girankerde yeno meşnayîş û nê çend serrê peyênan de duştê tecrîdî vejîyayo nuqtaya tewr berze. Bi taybetî 5ê nîsane ra nata ti xebere Ocalanî ra nînan girewtiş.

Şerwanê Yewîya Xoverdayîşê Şengalî (YBŞ) derheqê tecrîdî de qisey kerdî.

Şerwanêk YBŞyî bale ant ser muhîmîya Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ya seba êzidîyan û qiseykerdişê xo wina domna: "Êdî sîstemê Îmrali yê îşkenceyî nîno qebulkerdiş. Fikir û felsefeya ti kesî qasê yê Ocalanî feydeyê ci êzidîyan rê çin o. Paradîgmaya Rayber Apoyî hêz da êzidîyan.




**Şerwanê Yewîya Xoverdayîşê Şengalî (YBŞ) derheqê tecrîdo ke Rayberê Şarê Kurd Abdullah Ocalanî ser de yeno meşnayîş de qisey kerdî û seba ke têkoşînê xo gird bikerî veng dayî heme şaran**

Şarê êzidî ke hewn de bî, bi felsefeya Rayber Apoyî newe ra ganî bî. Hetê dewleta faşîste ra Rayberê ma ser de nê 17 serrî yo ke tecrîdêko girankerde yeno meşnayîş û ma nêyî qebul nêkenî. Ma do bi heme estena xo vera nêyî de têkoşîn bidî. Na çarçewa de ez veng dana heme şarê Kurdistanî ke wa seba azadîya Rayber Apoyî têkoşînê xo gird bikero."

**BÊ RAYBER NÊBENO**

Şerwananê YBŞyî ra Şahîn Xanesorî va 'Nizdîbîyayîşê dewlete yê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî rê seba ma xeta tewr hesas a' û qiseyerdişê xo rê wina dewam kerd: "Eke ewro şarê êzidî qirkerdişan ra rizgar bîyo, no saya Rayber Apoyî de yo. Rayber Apo omdiê azadîya şarê kurd û heme şaranê dinya yo. Hukmatê AKPyî seba ke têkilîya mabênê şarê kurd û Rayber Apoyî biqerifno, Rayberîya ma destê xo de bi hawayo esîr tepişeno. Wazenî bi no hawa şarê kurdî teslîm bigirî. Heta ke Rayber Apo azad nêbo, ma rê rehetî çin a. Çimkî bê Rayber Apoyî cuyayîşêk nîno fikiryayîş. Cok ra ma veng danî heme şaran ke wa ma beşdarê têkoşînî bibî û têkoşînê ma gird bikerî. Ma hewl danî ke serra 2017 bikerî azadîya Rayberî û Kurdistanî."



**DO WINA NÊMANO**

Şerwananê YBŞyî ra Şengal Til Ezerî zî wina va: "Eke ez tîya ra bivejîya, heme kesê ke engîşta înan qirbîyayîşê êzidîyan de esto, ganî yew bi yew înan ra hesab bipersa. Ma do vera nê tecrîdî de têkoşînê xo bidomnî. Eke ewro şarê êzidî xopawitişê xo kerdo û bîyo îrade, no saya felsefeya Rayber Apo û hewldayîşê ci de bîyo. Nizdîbîyayîşê dewleta tirk yê Rayber Apoyî, nizdîbîyayîşê ma yo. Ma do hîna qewetin bivinderî. Ancax ma eşkenî bi no hawa bivinderî. Wa dewleta tirk bizano, nê hêrişî do bêcewab nêmanî. Heta ke Rayber Apo azad bibo ma do xover bidî. Serra 2017 do bibo azadîya Rayber Apo û heme şaran."

XOSER ÇEWLÎG

# Ziwan, resnayîş û ziwannasî

Ziwan, tena wasitaya resnayîş yê eydî merdimî ya. Merdimî hîsanê xo, fikranê xo û waştişanê xo yewbînan rê bi rayîrê ziwanî resnenî. Cigêrayişê zanistkî, ziwanê dayike û tekilîya merdiman hema merdim pîzeyê dadî de bî dest pêkerdo. Hem ferd hem zî cuyayîşo komelkî de wina girîngîya ziwanî esta. Heqanî ke derheqê ziwanê dayike de yê zaf peymana mîyanneteweyî û qiseyan de vîyareno ke gera rêz rabimojnî heqên bingeyî yê gera bipawiyê.

Ziwan, merdimî rê rojbîyayîş ra yeno, merdimî bi ziwanî pêkerdiş kenî, çi ke eşnawito û çi ke hîs kerdo, sîstemê kî pêkerdiş kerdo bi çekuyan û bi nîşanan. No sîstem tena wasitaya pêkerdiş yê merdiman nêyo, keyeyê fikirî yo. Ziwan, têkilîya kultur û komelo ke ma tedeyê û estbîyayîşo ke ciwîyeno. Timûtim bedilnayîş mojneno ra aye ra ziwan ciwîyeno û xurt beno, prosesêko ganî yo.

Chomsky vato ziwan, "Sazkerdişê dinya û qasê sey sîstemê serê dinya de fikirîyayîş o. Yew wasitaya resnayîşî yo."

Ziwan, serê taybetîyê ke merdim kenî merdim de yeno. Mimkun nêyo ke yew komel bê ziwanî bo. Çunke merdim, bi ziwanî karano, wayîrê taybetîya qiseykerdişê ke yew estbîyayîş o. Her komel sey rewş û şertanê xo çekuyan berhem keno yan zî çekuyan ra newe çeku berhem keno. No semed ra sey tebîetê yew ewropayijî û asyayijî ziwanê înan zî cîya yo.

Şaxê zanistî tay hewceyan ra benî. Ziwan, ganî bi çaxan ewil fîlolojî badê cû zî mantiq û felsefe de bîyo babetêk. Tewir û estişê ziwanî, ziwan kerdo babeta zanistî.

Babeta bingeyî ya ziwannasî, awanîya ziwanê merdimî etud biko, viraştişê yew qaîdeyo zanistî, sedaqetê beyntarê qisa û hêmanê qisayan vejîyo orte û etudkerdişê ziwanê merdimî mîyanê heme zengînî û têmîyankerdişê.

2500 serrî ra dergêr o ziwannasî esta. Merdimî têgînê yê ke no viyarteyo tarîxî ra yenî û viraştişê gramerî muneqeşe kerdo û ramîyayîşê gramerî kerdo. Babeta bingeyî ya gramerî, awanîya bingeyî ya ziwanê merdimî etud kerdo û yew teorîyo zanistkî viraşto, mîyanê zengînî û têmîyankerde de ziwanê merdimî etud kerdo. Sey pêroyî armancê ke zanîyena ya ziwannasî verê her çî heme taybetîyanê ziwanî bişinasne û bide şinasnayiş.

Armancê ziwannasan yê etudkerdişê ziwanî wina yo; "Viraştişê teorîyêkî gramerê pêroyî yê heme ziwanan hewce yo; sey sîstemêko qefilnayî fikirîyenê musnayîşê ziwanî şirovekerdiş, her qiseykerdox çi ra û senî ziwanê dayika xo de cumleye ke bê hûmarê qet nêeşnawitê, îzahkerdişê fehmkerdiş û berhemkerdişê înan o.

Ziwannasî mîyanê armancê pêroyî û şinasnayîş de yo, gramer analîzê ziwanan yanî şekl û vengê yew ziwanî û viraştişê cumle etud keno û şaxêko qaydeyan belî keno. Gramer mîyanê xo de goreyê hêmanê ziwanî rê ke etudkerdê tewir bi tewir beşî estî.

Qisimo ke vengê ziwanî etud keno ey rê vanî "zanayîşê vengî", hetê awanî ra qisimo ke çeku û şekilan babete keno, ey rê vanî "zanayîşê şeklî", cayo ke çeku û şekil tira vejîyenî, yanî qisimo ke ristimê înan cigêrayîş keno ey rê ristim yan zî vanî "peydabîyayîş", têkilîyê ke beyntarê çeku û şekilan de yê û şaxêko cumleyan etudkeno ey rê vanî zanayîşê cumle yan zî rêza qisa, qisimo ke mekanîzmaya viraştişê mana ya ziwanî etud keno ey ra vanî semantîk. Ziwan, ancax bi ney hêmanan temam beno, gramer zî ney hêmanan ra yeno meydan. Ney beşî pêro pîya cîya cîya etud bî, yewbînan ra qet cîya nêbenî û her wext benê têmîyan ra.

Vengêkoy

## Sembolê yewîtîya kurdan Kobanê



Nêsrîn Navdar

Etya ra di serrî verê cû dagirkerê her çar parçeyanê welatê ma, heme serdestê dinya, şarê dinya pêro û şarê kurdî bî şahidê gamêka tarîxî ya mîyanberê kurdan de ke heta aye roje rîpelanê tarixî de nêameya qeydkerdişî.

Wexto ke çeteyanê DAIŞî ke ters û sawê xo vistibî heme Rojhelato Mîyanênî û heme dewletanê dinya verê xo dabî Kobanê û waştbî hovîtîya xo şexsê şarê Kobanê de kurdan ser de pêk bîyarî bi awayêke ke qet înan û dewletê pêgirote û destekarê înan texmîn nêkerdibî ke go kurdê bêdewlet û bêqiwetî hemverê înan de bi nê awayî xo ver bidê raşt ro xoverdayîşê kurdan ameyî.

Vatişê Serekkomarê Tirkîya bi xo ke vatbî; 'Kobanê kewte, go bikewo' bawerîya înan a ke go kurdî nêeşkê hemverê înan de xo ver bidê baş moştêne ra. Bi qasê înan, senîn ke bi saetan şaristanê sey Mûsil, Ramadî, Felûce, Reqqa, Palmîra, Deyrîzor, Cerablûs û şaristanê bînî ke bi rehetî girotîbî û ters û xofê xo vistibî heme şaran û dewletan ser de go Kobanê zî bi rehetî bikerdêne binê dagirîya xo.

Bi nê fikrî DAIŞî bi destekê hevalbendanê xo 133 rojî Kobanê binê dagirîya xo de verda. Elektrîk û awe şarê Kobanê ser de birna û bi hovîtî înan ser de şi, la gama tarîx 26ê çileyê 2015î moşte ra heme dinya qehremanî û lehengîya şarê kurdî rê bî şahid û şarê kurdî zî yewîtîya xo rê bî şahid ke tarîx de raya yewine pêk ameybî û peynîya ey serkewtişê hemverê dagirkeranê hovan û xelasîya binê dagirîya înan ra bî.

Dimayo ke serdestanê dinya qerardarîya kurdan a azadî û xoserîya xo rê dî, fek bêvengîya xo ya hemverê hovîtîya DAIŞî ra vera da û waştî ey serkewtişê girdî yê kurdan ra para xo zî vecê û qerar girotî ke hemverê çeteyanê DAIŞî de hetkarîya kurdan bikerê.

Bi raştî eke şarê kurdî bandorê yewîtîya xo bivîno û bifikirîyo ke yewtîya înan çiqas serkewtiş û azadîya înan rê bena sebeb, go çi ray fek yewîtî ra vera nêdo û azadîya xo nêkero qurbanê nehfanê xo yê şexsî.

Kurdanê ke her tim semedê dagirkerdoxanê welatê xo seferber bîyê, înan rê şiyê şerran û xo kerdo fedayê hukimdarîya înan raya yewine semedê şarê xo axa xo seferber bî û peynîya na seferberîya xo de bi ser kewtî û cayêke bi rûmet û qedirberzî mîyanê şaranê dinya de girot.

***

Bi kilmî ma eşkenê vacê ke kurdan her tim şaranê binan rê xo kerdêne feda la verê şaranê dinya de qedrê înan kewtêne. Wexto ke semedê rûmetê xo û şarê xo xo kerd feda na ray qedr û rûmetê înan heme şaranê dinya ver de virazîya û hemine serkewtişê înan rê çepikî kerdî. No yeno zanayîşî ke merdim heta xo nêresneno azadîya xo qîmetê fedakarîya merdimî yê binan rê nîna dîtişî û merdim çinêhesabbîyayîşî rê beno mehkûm.

Loma lazim o ke şarê kurdî serkewtişê Kobanê sey sembolî bigîro dest û heta azadîya heme parçeyanê erdê xo qezenc bikero bi rihê Kobanê yewîtîya xo xurt bikero.

www.arsivakurdi.org

## Wazenî rojnamegeran terbîye bikerî



Rojnameger Burcu Karakaşa ke bi xeberanê xo yê ke neheqîyan ser o viraştî yena şinasnayîş, bado ke Rojnameyê Mîllîyetî ra ameye vetiş, o wext ra nata bi hawayo serbest xebetîyena. Karakaşe kitabê xo yo yewin ke bi nameyê 'Manşetlerî gor, aklini kaçirirsin' ra dima nika zî kitabê xo yo dîyin yê bi nameyê 'Yalan Dunya: Reytîngler, Tiklar ve Şîmdî Reklamlar!' vejîyaye duştê taqîpkaranê xo.

Karakaşe nê kitabê xo de qala reytîng û tîrajan kerda û raştîya nê reytîng û tîrajan ser o vindeta. Karakaşe kitab de bi akademîsyen û kesê ke mîyanê çapemenî de yenî naskerdiş, qisey kerda û vînayîşê înan girewta.

**MERDIM NÊEŞKENO XO BIRESNO**

Karakaşe vana 'tayîn xebatkarî nêwaştî ke nameyê înan kitab de bêro nuştiş' û wina domnena: "Merdim nêeşkeno xo biresno hûmara rastikêne ya tîrajan. Xora nameyê kitabî zî nê semedî ra ma kerd 'Dinyaya Zure'. Çimkî hûmara tîrajan ser tayê têkilîyan ra yena zêdekerdiş û no het de her kes yewbînan xapêneno. Pere zî nê têkilîyan ser ro gêreno."

**ÇEKUYA ZEXT KÊMÎ MANENA**

Karakaşe dewamê qiseykerdişê xo de bale ante zextê ke çapemenî ser de benî û wina dewam kerde: "No hîna çîyo ke yeno asayîş o. Goreyê mi çekuya zextî hetê nê kerdişan de kêmî manena. Rojnameger û dezgehê çapemenî binê hêrişanê topyekunan de yî. Bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî rojname, televîzyon û radyoyî pêsero pêsero ameyî padayîş û ma donemêko winasî de yî ke rojnamegerî bi bêkarî û hepisxane yenî terbîyekerdiş."




**EZ BAWER KENA KE DO RAŞT BIBÎ**

Karakaşe peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Ez bawer kena ke do rojêk heme çîyî raşt bibî. Rojnamegerê ke bêkar î, ganî modelanê bêkarî ser o bivinderî. Vanî 'rojnamegero tewqîfkerde çin o', eke çimê înan de yê ke kartê înan yo zerd esto, tena ê rojnamegerî, o wext ez zî rojnameger nîya. Çimkî ez bi hawayo serbest xebetîyena. Êdî ti manaya vatişê 'rojnamegero tewqîfkerde çin o' nêmende." **ŞÛJIN**

# Ganî ma wayîr bivejyî

**Cinîyê êzidî tecrîdo ke Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ser de yeno meşnayîş ser o wina vatî: "Eke ma fermanî ra ver fikir û felsefeya Rayber Apoyî nas bikerdênê, ewro hende cinîyê êzidî nêkewtênê destê çeteyanê DAIŞÎ"**



Raybere PKKyî Abdullah Ocalan 15ê sibata 1999 ra nata Girawa Îmrali de yeno tepiştiş. Ocalan serra 2011 ra nata bi avûkatanê xo û 2015 ra nata zî heyetê HDPyî yê Îmrali reyde pêvînayîş nêkeno. Tewr peynî çalakîya grevê vêşanî ke 50 sîyasetmedarê kurdî Amed de daybî destpêkerdiş ra dima birayê Ocalanî Mehmet Ocalan 11ê êlula 2016 de şîbî Îmrali û pêvînayîş kerdbî. O tarîx ra nata ti xebere ci ra nîna girewtiş.

Cinîyê êzidî yê ke Şengal de manenî, vera tecrîdo girankerde de qisey kerdî û reaksîyonê xo nîşan dayî.

**FIKIR FIKRÊ AZADÎ YÎ**

Cinîyan ra Wetha Emare va 'ganî Rayberê Şarê Kurd mîyanê çar dêsan de nêro girewtiş' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Ez silam û heskerdişê xo tîya ra heta Îmrali erşawena. Ma zaf wazenî ke Rayberê ma mîyanê çar dêsan ra bivejîyo. Ganî Rayberî mîyanê ma de bicuyo. Heta Rayber Apo hepisxane ra nêvejîyo, sey cinîyê êzidî do zerrîya ma bibirîn bimana. Fikrê Rayber Apoyî, fikrê azadî yî, cok ra ganî heme cinî xo nizdîyê Rayber Apoyî bivînî. Heme cinîyî eşkenî xo fikrê Rayber Apoyî ser ro azad bikerî. Seba ke ma Rayberê xo hetê xo de bivînî, ganî ma têkoşîn bidî. Ez veng dana heme cinîyanê êzidî, wa Rayberê xo rê wayîr bivejyî û seba azadîya ci têkoşînê xo gird bikerî."

**WA WAYÎR BIVEJYÎ**

Adûl Elîye zî bale ante azadîya Ocalanî ser û qiseykerdişê xo rê wina dewam kerde: "Waştişê ma no yo ke wa Rayberê ma azad bibo û bêro koyê Şengalî de mîyanê cinîyanê êzidî de bicuyo. Rayber Apo seba ma cinîyanê êzidîyan xeta azadî yo. Cinîya êzidî xo bi fikrê Rayberî nas kerde û êdî êdî ver bi azadîya xo şona. Fikrê Rayberî fikrêko pak o, ganî her cinî xo bi fikrê Rayber Apoyî perwerde bikero û xo bişinasno.







Bitaybetî cinîyê êzidî lazim o Rayberî baş bişinasnî. Ez veng dana cinîyanê cîhanî, wa wayîrê Rayber Apoyî bivejyî. Heta Rayber Apo azad nêbo, ma cinîyî zî azad nêbenî."

**XO RÊXISTINE KENÎ**

Hîba Mîrade zî wina va: "Roja ke fermanê ma êzidîyan vejîya, o wext ma bêxera hêzê Rayber Apoyî ti kesî hetê xo de nêdî. Rayberê ma mîyanê çar dêsan ra hêzê xo seba hetkarîye ma rê erşawit û ma fermanî ra xelisna. Eke ma fermano ke 3ê tebaxe de bî ra ver fikir û felsefeya Rayber Apoyî nas bikerdênê, o wext cinîyê ma hende nêkewtênê destê DAIŞÎ. Ma cinîyê êzidî fermanî ra dima fikir û felsefeya Rayber Apoyî nas kerd. Nika zî ma xo bi fikir û felsefeya Rayber Apoyî rêxistine kenî. Ma êdî tecrîdo girankerde qebul nêkenî. Ganî Rayberê ma reyde pêvînayîşî bêrî kerdiş û Rayber Apo azad bibo." *ŞENGAL - ŞÛJIN*

# Ma do doze bikirêşî mehkemeya berze

Ceylan Onkola ke 28ê êlula 2009 de dewa Şenlîkî ke giredayeyê Licê ya de, heywanan çerênayêne, netîceyê qereqolê Yayla ra eştişê topê hawanî de 12 serreyî xo de merde. Keyeyê Ceylan Onkole qewimîyayîş ra dima muracatê Mehkemeya Heqê Merdiman ya Ewropa (AÎHM) kerdbî. AÎHMî qerar da ke hetê 'îxlalê heqî û berpirsîyarîya tehqîqato bitesîr de ti neheqî nêameyo kerdiş' da.

Babete ser o Avûkat Rehşan Bataraye qisey kerde û qala prosesê ke badê serra 2009 kerde.

Bataraye qiseykerdişê xo de va 'ma badê ke bêhuqûqîyê mehkemeyê dewleta tirk dî, ma muracatê AÎHMî kerd' û wina domnaye: "Wexto ke qewimîyayîş virazîya dozger û cendirme bi mehneya ewleyî nêşîyî cayê qewimîyayîşî. Merdim, dorme û dewijî şîyî laşê parçekerde yê Ceylan Onkole arê dayî. Karê otopsî maseyê cendirme ser de ame kerdiş. Dosyaya Onkole de zî qerarê nimiteyî esta. Goreyê qerarê înan teqîyayîş netîceyê pirodayîşê madeyê teqayîşî yê Ceylan Onkole de teqayo. Yeno vatiş ke hedîse ver Onkole merda. Labelê Pirsporê Tibî yê Edlî Umît Bîçenî raporêko alternatîf û zaf hîra amade kerd."

**MA DO BIKIRÊŞÎ**

Bataraye da zanayîş ke AÎHMî goreyê raporê dozgero ke tehqîqat de wezîfedar bî, qerar da û qiseykedişê xo wina qedênaye: "Seba ke destê ma de delîlê teqayîşî çinêbî waştişê ma hetê mehkeme ra ame redkerdiş. Labelê şahidê qewimîyayîşî zaf î. Netîce se beno wa bibo berpirsîyarîya dewlete esta. Dewlete bi pakîyê herême û haletê teqayîşî ra berpirsîyar a. Her çiqas ke AÎHM qerarê îptalî bido zî ma do doze bikirêşî Daîreyo Gird yê AÎHMî." *AMED - DÎHABER*





# No qerar bi hawayo kêfî ameyo girewtiş

Îxlalê heqê merdiman her ke şono zêde beno; bitaybetî zî hepisxaneyan de. Hemserekê Şaredarîya Nisêbînî Sara Kayaye 13ê çileyê 2017 de netîceyê eştişê polîsan yê keyeyan ser de 12 kesan reyde ameybî tepiştiş. 12 kesan ra tena Sara cinî bîye. Saraye 14 rojî nezaretxaneyê Qereqolê Nurettîn Ersoyî de tena ameye vindarnayîş.

Avûkatî dîyar kerdî ke goreyê mevzuatî hereket nîno kerdiş û wina vatî: "Sara 14 rojî nezaretxaneyo ke vera şaredarî de yo de tena ameye vindarnayîş. Bi hawayo tepiştişê Saraye de mesajêk ame dayîş. Ma seba rewşa Saraye dozgerî reyde pêvînayîş kerd. Labelê çîyêk nêame kerdiş. Dozgerî ma ra va; çîyo ke ez bikerî çin o, destê mi ra çîyêk nîno. Mudirîya Asayîşî nê qerarî da."



**BI CAMÊRDAN BERDÎ**

Avûkatî dayî zanayîş ke wexto ke Saraye berdî muayene 11 camêrdan reyde berdî û qiseykerdişê xo wina qedênayî: "Sara bi îdîaya 'xirakerdişê yewîya dewlete' yena tepiştiş. Ma persan ra fehm kerd ke derheqê Saraye de ti delîlî destê înan de çin î. Hedefê tewqîfkerdişî çinkerdişê sîyasetî yo. Bi rayîrê tewfîqkerdişê sîyasetmedaran şarî rê mesaj yeno dayîş. Zaf balkêş o ke yeno îdîakerdiş ke Saraye wextê qedexeyê teberveјîyayîşî de seba pêvînayîşî şîya taxê ke hetê hukmatî ra ameyî qedexekerdiş. Wextê qedexeyê tebervejîyayîşî de mîlçike daxî nêeşkayêne taxe ser de bifira, Sara do senî bişîyêne taxe? Zaf dîyar o ke no qerar bi hawayo kêfî ameyo girewtiş." *MÊRDÎN - ŞÛJIN*

www.arsivakurdi.org

ROJEVA
# Medya
29 Çile Yekşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
*Yenişehir-DİYARBAKIR*

*Tel:* 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
*İstanbul:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. *No:* 23/A
*Küçükçekmece İSTANBUL*
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Adana:* Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
*No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
*e mail:*
rojevamedya@hotmail.com

## Alîgirên jin zayendperestiya li trîbunan hildiweşînin

Jin jî êdî rengê xwe didin sahayan û ji bo sporê jî nêrîneke nû didin qezenckirin û li trîbunan li dijî zayendperestiyê tê dikoşin. Li trîbunan hejmara jinan her ku diçe zêdetir dibe. Jin ne tenê li trîbunan di mijarên civakî de jî hestiyariya xwe derdixin holê.

Koma alîgiriyê ya jinan a fermî ya Amedsporê Mor Trîbun di her derfetê de li trîbunan li dijî zayendperestiyê tê dikoşe. Bi saya van jinan trîbunên Amedê bi jinan tijî dibin. Di heman demê de li dijî pirsgirêkan jî bi hestiyarî tev digerin û di her maçê de li gel Amedsporê ne. E yek jî wêrekiyê dide sempatîzanên jin ên Amedsporê.

**BERXWEDANA DÊRSIMSPORÊ**

Koma jinan a alîgiriyê ya Dêrsimsporê jî heye ku navê Berxwedan li xwe kirine. Jin di her maçê de rengê xwe tev li trîbunan dikin. Jin bi kêfxweşî piştgiriyê didin tîma Dêrsimsporê. Jinan da zanîn ku dê berxwedanê mezin bikin.

**AZÎZEYÊN BAJÊR**

Koma jinan a alîgiriyê ya Hopasporê jî ji xwe re dibêje 'Azîzeyên Bajêr' û jinên endamên vê komê jî bi rengên xwe li trîbunan cihê xwe digirin û tîma xwe tenê nahêlin. AMED






## Mînaka serkeftina jinan 'JIYAN'

Tevî hemû zor û zehmetiyan jinên ku li ber xwe didin bê navber zêde dibin. Yek ji jinên ku hêviyê dide jî Jiyan Helîn a 40 salî ye. Jiyan ji zarokatiya xwe ve li dijî newekheviya zayendî tê dikoşe û wekî wateya navê xwe çîroka xwe bi baweriyeke mezin vedibêje. Jiyana ku zaroka herî biçûk a 6 xwişk û birayên xwe ye, got ku ew di bin siya birayên xwe de mezin bûye û wiha pê de çû: "Ez li dijî zextên wan tê dikoşiyam. Heta ez zewicîm ez di nav pevçûna mêr û jinan de bûm. Min di vê têkoşînê de her tim xwe didît."

Jiyanê bi lêv kir ku ji ber zextên civakê neçar maye bizewice û ji ber nasnameya wê ya jintiyê nehatiye nasîn û fikrên wê hatine astengkirin. Jiyan destnîşan kir ku ji ber van sedeman dev ji hevjînê xwe berdaye û wiha got: "Piştî ku ji hevjînê xwe veqetiyam ez bi du keçên xwe re li cem birayê xwe mam. Min got ez xanî ji xwe re bikirim, li dijî vê derketin. Gotin jin nikarin bi tena serê xwe bijîn. Ez li dijî vê derketim û min xaniyek kirî."

**JIN KEDKAR IN**

Jiyanê da zanîn ku beriya zewacê xeyala wê ya herî mezin vekirina dikaneke dirûnê bûye û axaftina xwe wiha bi dawî kir:" Tevî gotinên ku tu nikarî bikî jî, min dikan vekir. Çer ku min dikan vekir muşteriyên min çêbûn. Jin gelekî kedkar in. Bila bi xwe bawer bin dê bi ser bikevin. Karê ku mirov bi ser nexe tune ye." *BEDLÎS - ŞÛJIN*



# Pezkoviyan difiroşin nêçîrvanan!

**Pezkoviyên ku li Semsûrê ji ber sermaya zêde xwe ji xwezayê berdidin gundên derdorê, dibin hedefa şîrketin nêçîrvaniyê. Gundiyan bertek nîşanî nêçîra pezkoviyan dan û xwest nêçîr bê qedexekirin**

HACI YUSUF TOPALOGLU / SEMSÛR - DÎHABER

Pezkoviyên li herêma Qelaçî ya Tûrdereya Semsûrê dijîn, ji ber berfa zêde di warê dîtina êm de rastî tengasiyan tên û ji ber vê yekê xwe bera gundên hawirdorê û keviyên rêyan didin. Pezkoviyên ku li navçeya Çêlikan dema tên dîtin, di dema lêgerîna êm de dibin hedefa nêçîrvanan. Niştecihên gundê Baglicayê yên di warê xwedîkirinê de alîkariya pezkoviyan dikin, li dijî nêçîra qanûnî û derqanûnî ya pezkoviyan bi bertek in.

Gerînendeyê Şaxa Parkên Neteweyî yê Semsûrê İsmaîl Kozan diyar kir ku her sal ew bi awayekî nîzamî xebatên envanterî dikin û wiha got: "Li gorî encamên envanterê hejmara nêriyan tê diyarkirin, ji bo ku bên îhalekirin di çarçoveya turîzma nêçîrê de em ji wezareta têkildar re dişînin." Kozan piştî van agahiyan li xwe mikur hat û got ku ew pezkoviyan difiroşin nêçîrvanan.

**QEDEXEKIRINÊ DIXWAZIN**

Kozan anî ziman ku li gorî encamên xebata envantera kanûna 2016'an li herêmê 3 hezar û 92 pezkovî hebûne û wiha pê de çû. "Ji bilî nêçîra turîzmê ya pezkoviyan, nêçîra wan qedexe ye. Ji nêçîra ku ji bilî vê tê kirin cezayê pereyê îdarî û tazmînatê tê birîn.

Ji niştecihên gundê Baglicayê Alî Çokguler ê 60 salî jî got ku ew dixwazin nêçîra qanûnî jî bê qedexekirin û wiha axivî: "Tên li heywanan didin, lê belê em nizanin ji ku derê tên. Di van mehan de sewal tên van deran û diçêrin. Di dema bax û baxçeyan de, her çend xisarê didin baxçeyên me jî, lê em xisarê nadin wan. "

**NÊÇÎRA ŞÎRKETAN**

Ji niştecihên gundê Baglicayê Ensarî Uzun ê 48 salî jî anî ziman ku demeke dirêj e pezkovî li herêmê dijîn û bi lêv kir ku di warê têkoşîna nêçîrvaniya qanûnî de rayedar baş tev nagerin. Uzun destnîşan kir ku li gel nêçîra qedexe, nêçîra qanûnî jî ji bo pezkoviyan talûke ye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi qasî em dizanin, li ser esasê faaliyetên nêçîrvaniyê didin firmayan. Ev firma jî tên ji nav heywanan nêriyên herî baş dikujin. Niha nêriyên van heywanan, yanî yên mezin tune bin dê çêlikên wa nikaribin di nav berfê de tev bigerin. Dema nêrî jî bên nêçîrkirin, dê sewal rastî her cure talûkeyê bên."



# Cotkarên Efrînê amadekariya demsala nû dikin

CEFER CEFO / EFRÎN - ANHA

Xweza, hewa, av û axa kantona Efrînê ji çandiniyê re pir baş e. Cotkarên kantonê di vê demê de amadekariya demsala çandiniyê ya nû dikin; tovên sebzeyên wekî xiyar, îsot, bacanên reş û sor, kundir û zebeşan diçînin û ji sermayê diparêzin da ku di meha adarê de şitlên wan ji çandiniyê re amade bin.

Cotkarê bi navê Hisên Hesen Hemo yê ku ji navçeya Mabeta ye û pîvaz çandine, der barê çandiniyê de ev tişt got: "Dema ku pîvaz eşqin bidin, bi ser rûyê erdê dikevin, em semadê lê dikin û av didin."

Cotkarê bi navê Idrîs Mihemed ê ku ji navçeya Cindirêsê ye jî cureyên sebzeyan wekî xiyar, îsot, kundir, bacanên reş û sor û zebeş çandine got ku ew niha tovan diçînin, şitlan jî di meha adarê de diçînin û di meha gulanê de jî berhemên xwe berhev dikin.





## Pira dîrokî li trafîkê nayê girtin!

Li navçeya Yuregirê ya Edeneyê Pira Mîsîsê ya dîrokî ji ber ku nayê parastin û deriyê wê li trafîka maşîneyan nehatiye girtin, roj bi roj tê rûxandin. Pira dîrokî ya Mîsîsê ku di sedsala 4'an de di serdema Împaratoriya Romayê de ji aliyê Flavus Julius Costantinus ve hatiye avakirin, ji ber ku nayê parastin, hildiweşe. Pira Mîsîsê ku li Anatolyayê wek Pira Romayê tê zanîn, di serdema mîrnişîniya ramazanoglu û osmaniyan de ji ber erdhejên wê demê zerar dit, lê xera nebû. Pira ku wê demê xera nebû, niha maşîneyên giran di ser wê re derbas dibin û tê rûxandin.



Pira Mîsîsê di heman demê de bi çîroka Hekîmê Lokman a ku reçeteya dermanê nemiriyê nivîsandiye û li ser vê pirê bi avê de berdaye jî tê zanîn. Şêniyên taxa Mîsîsê dixwazin ev pir li tirafîkê bê girtin û bê parastin. EDENE - DÎHABER



www.arsivakurdi.org